Bidestveanîna Mafên Netewî Yên Gelê Kurd Di Çarçoveya Îranek Demokratîk û Federalî de

Hejmar: 156
5'ê Nîsana 2011
Buha: 150 Tûmen

# Agirî

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîn www.kurdistanmedia.com/kurdi

Di paşkoya taybet bi vê hejmarê de:

- Peyama Deftera siyasî a PDK Îranê bo roja şehîdên Kurdistanê

-Giringî û hewcehiya bibîranîna 10'ê Xakelêwe bo gelê Kurd, bo PDKÎ

-rapora rê û resma 10'ê Xakelêwê, roja şehîdên Kurdistanê li binkeya Deftera Siyasî a PDK Îranê

## NY lêkolînê li ser pirsa mafê mirovan di Îranê de dike

Rejîma Îslamî ya Îranê demek dirêj e ku mafê mirovan binpê dike, kesên girtî mafê xwe û parastinê tune ye.

Dadgeh biryarên bêhiqûqî dide, îdamên piralî pêk tên, di girtîgehan de îşkence didome û mafê Kurdan yê netewî nayê naskirin.

Parêzvanên mafê mirovan, siyasetvan û rojnamevan tênê girtin û îşkencekirin.

Pirsa mafê mirovan li Îranê zextek giran û berpirsiyariyek mezin dida ser milê NY. Rexne û giliyên li dijî Îranê roj tune ye ku neçe cem hêzên navnetewî û yên însanî.

Konseya Mafê Mirovan ya NY ew pirs anî rojeva xwe û dê raportorekî taybetî vê YN bişîne Îranê.

## Xwenîşandana xelkê Tewrêzê rastî êrîşa hêzên rejîmê hat

Civîna Nerazîbûnê a xelkê Tewrêz û Urmiyê bi nîsbet siyasetên şaş ên Komara Îslamî a Îranê li dor hişikkirina gola Urmiyê li roja 2'ê Nîsanê de rastî êrîşa hêzên rejîmê hat. Di encam de nizîk 70 kes ji wan destbiser kirin û 20 kes ji wan birîndar kirin ku birîna 4 ji wan giran e. Tê gotin ku xwenîşanderan durûşmên nasyonalîstî û yên dijî rejîma Komara Îslamî diqîrandin û siyaseta Komara Îslamî derheq xemsariya bi nîsbet gola Urmiyê de şermezar kirin.

# Hizra Pêşewa bersivderê xebata modern a serdem bû



Roja 10'ê Xakelêweya 1390'ê Rojî, bi boneya 10'ê Xakelêwe, roja şehîdên Kurdistanê û 64'emîn salvegera lisêdaredana Pêşewa Qazî Mihemed û hevalên wî, rê û resmek hêja li binkeya deftera Siyasî a PDK Îranê bi beşdariya endamên rêberî yên partiyê, kadr û pêşmerge û malbatên wan birêve çû. Rê û resim ji du beşan pêkhatibû, beşa yekem seredana mezara şehîdên kurdistanê û danana tacegulê li ser gulkoya şehîdan û seredana salona şehîdên PDK Îranê ku bi wêneyên şehîdan ve hatibû xemilandin. Li beşa duyem a rê û resmê de peyama Deftera Siyasî a PDK Îranê ji aliyê birêz Rostem Cehangîrî, endamê Deftera Siyasî yê partiyê ve hat pêşkêşkirin.Herweha endam û alîgirên PDK Îranê li piraniya gund, bajarok û bajarên kurdistanê de çalakiyên berfireh yên teblîxî birêve birin. Deqa nûçeya birêve çûna rê û resmê û peyamê li taybetnameya vê hejmarê de dikewe ber çavên we hêjayan.

## Berdewamiya xwenîşandanên Sûriyê û nîgeraniya Îran, Hemas û..

Di dirêjiya wan nerazîtiyên li Sûriyê de, her du girûpên Felestînî, Hemas û Cîhada Îslamî ên hevalbendên Komara Îslamî di rojên derbasbûyî de pêwendiyên cuda li gel welatên Îran û Qeterê girtine û daxwaz ji wan kirine ku bîroyên xwe bişînin wan welatan.

Li gor ragihandinan, Emîrê Qeterê daxwaza Hemasê pejirandiye, lê li hember daxwaza Cîhada Îslamî razî nebûye û saziya han li cihê Qeterê, Îran kiriye armanc ji bo şandina bîroya xwe û rejîma Îranê jî heya dema ku rewşa Sûriyê hêmin dibe, ew yek pejirandiye. Hêjayî gotinê ye ku di çend rojên derbasbûyî de çendîn endamên Sipaha Pasdaran a Komara Îslamî ji aliyê xelkê nerazî yê Sûriyê ve hatin destbiserkirin û çendîn kes ji xwenîşanderan jî ji aliyê hêzên Sipahê ve hatin kuştin û birîndar bûn.

Ji aliyek din ve, Malpera Emariyon di ragihandinekê de têkiliyên Komara Îslamî û Hizbullaha Lubnanê di pêvajoya nerazîtiyên Behrînê de piştrast kir û xwazyarê têkiliyên pêtir bû.



**Hevpeyvînek taybet li gel** birêz Mistefa Hicrî...

Mistefa Hicrî

Beşdarînekirina xelkê Kurd di refrandoma diyarîkirin cura hikûmetê û xebata wan dijî rejîma ...
R: 3



**Ji gotinê heya** pêgavên bi kiryar

Ebdulla Hicab


Diyarî kirina raporterê taybet ji bo çavdêriya Mafên Mirovan li Îranê ji aliyê Konseya Mafê Mirovane Neteweyên Yekgirtî ve pêgavek erênî û di ciyê xwe de bû ... R: 6



**Sîstema perwerde** û çend gotinek!

Sadiq wehdanî

Sîstema perwerde û hînbûna niha ya Îranê, sîstemek e di xizmeta siyasetên Komara Îslamî de ... R: 9



**Hevpeyvînek taybet tevî** Dr. Abdulwehab Xalid, ...

**Me bivê yan nevê, îro be yan sibe be, pêwîst e ku Kurd Elifbêya zimanê xwe ber bi Latinî ve bibin**
R: 10

# Seredana heyetek "Komele-Partiya Sosiyal Demokrat a Kurdistanê" bo Deftera Nûneratiya PDK Îranê li Hewlêrê

Li gor rapora nûçegihaniya Kurdistanê, piştînîvroya roja Pênşem, 30'ê Adarê, şandek ji Endamên birêveberiya "Komele-Partiya Sosiyal Demokrat a Kurdistanê" bi serokatiya "Ebe Dilêr", seredana Deftera Nûneratiya PDK Îranê li bajarê Hewlêrê kir û ji aliyê heyetek Partiyê bi serokatiyê Kawe Behramî, Endamê Deftyera Siyasî ve, hatin pêşwazîkirin.



Di hevdîtina her du aliyan de, Kawe Behramî basek siyasî li ser rewşa Kurd bi giştî û helwest û nêrîna PDK Îranê li hember pirsên siyasî ên Îranê û Kurdistanê, pêşkêş kir. Herweha her du aliyan dan û standinek li ser çendîn pirsên pêwendîdar bi Partî û tevgera Kurdî kirin.

## Sergotar

### Sûriyeya hevalbendê Îranê û pêlên tisonamiyê

Selîm Zencîrî

Erdhej û tisonamiya ku li Bakûrê Afrîqayê ve ber bi Rojhilata navîn birê ket, her ku diçe pêlên xwe berfirehtir û bandora xwe jî kûrtir dike. Niha pêlên hêrsa xelkê bêzarbûyî ji totalîtariyê bera xwe dane Sûriyaya nizîktirîn welatê Erebî yê hevalbendê rejîma Komara Îslamî li deverê de û stûnên wê xistine lerzînê û wekî xuya dê bigîje encamê. Durûşm û silogoganên dijî hikûmeta Beşar Esed û rejîma Beis, weke ''Ne hizbula ne Îran'', ''Sûriye, Xuda û Azadî'', û herweha şevitandina wêne û awahiyên rejîmê û herifandina heykelên Hafiz û Beşar Esed jî selmênerê vê rastiyê ne. Vê bahozê serbarê tirs û xof xistine nav dilê rayedarên Sûrî û rejîma Beis de, tav û lerz jî xistiye cismê hevalbend û şirîkên xwe, anku Komara Îslamî, Hizbulah, Hemas û Cehada Îslamî de.

Ew jî pê hesiyane ku êdî dawiya wan hatiye û dibe zû yan dereng li dadgeha wijdan û mirovahiyê de bên darizandin. Lê carê berxwe didin û em dibînin ku li demên hesas û dijwar de çawa pişta hev digrin û hevkariya hev li tepeserkirin û fetisandina dengê xwepêşandanan de dikin; herweha bi mifahstandina ji taktîk û senaryoyên hev û din, dixwazin xwe ji vê peşqela agir û pêlên tisonamiyê biparêzin. Li vê derheqê de wekî xuya, serbarê wê ku îtirafê bi kêmasiyan, zulm û bêmafkirina xelkê nakin, hewil didin xwastên xwenîşandan û neraziyan bê bingeh, û bi pîlan û kompiloya derekî û deste û kirêgirtiyên biyaniyan û fitneçî bidin zanîn û dixwazin tenê ji riya serkut û tund û tûjiyê ve jîna xwe ya siyasî bo midehek din biparêzin û dewam û qewama xwe jî garantî bikin, lê bêhay ji wê ku êdî dema olîgarşîtî, zordarî û dîktatoriyetê bi dawî hatiye û cihê xwe daye demokrasî, azadî, wekhevî û toleransê û her astengekê jî li ser riya xwe radimalîne.

Lê eva xeslet û têgihîştina dîkatoran e ku yan dengê xelkê nabihîzin, yan dereng dibihîzin yan jî bi tirs ve guhê xwe li hember daxwaziyên gel de kerr dikin û her dirêjî bi siyasetên hovane û dijî mirovî ên xwe didin û ders û şîretê ji dîrokê û dîktatorên din wernagirin.

Dufaqiya li siyaseta derve a wan, dijkiriyar û reaksiyonên wan jî li hember bûyeran de diyar û berçav in, hewil didin kembera xwe ya emnî li deverê de serbarê parastinê, bihêztir bikin û ji bo fetisandin û tepeserkirina xwenîşandanan ji hêzên bêrehm û hov ên hevdu mifahê distînin û li pêvajoya nerazîbûn û serhildanên vê dawiyê li deverê de, li welatên hevalbend û nizîkên xwe de piştevaniya hikûmetê dikin û li welatên hevrik û dijberên xwe de jî pişta gel digrin û wan zêdetir tehrîk û diazirînin; her eva jî bûye sedem ku destê wan bi başî rû bibe û bi taybetî têkiliyên wan bi welatên cîran re bi xirabtirîn rewşê re ber bi rû bibe.

Bi giştî êdî dor gihîştiye Sûriye, Îran û dîktatorên din jî û nikarin heta ser berdewam bin û bi siyaset û yasayên sedsala navîn bi xelkê re bilivin û dibe yan xwe ji nû de biguherin ku eva jî gorî îdeolojî, siyaset û hizrîna wan nemimkin e, yan jî mehkûm bi nemanê ne û û ew jî dê li dewsa birayên xwe li Tûnis, Misir û Lîbiyê de biçin. Lewma serketina gelên Sûriyayê, serketina hemû azadîxwazan û bi taybetî gelên Îranê ye û tesîrek rasterast li ser çareseriya pirsa Felestîn – Îsraîl û kirîza Lubnan û herweha kurtbûna destê rejîma komara Îslamî heye.

## Beşdariya şandek PDK Îranê di rê û resma sersaxiya dayîka Wezîrê berê yê Navxweyî yê hikûmeta Herêma Kurdistanê

Roja Înê, 1'ê Nîsanê, heyetek PDK Îranê bi serokatiya Mihemed Nezîf Qadirî, Endamê Deftera Siyasî yê Partiyê, li gundê Karêze a ser bi Qezaya Kelarê, di rê û resma sersaxiya Hacî Rehme Hemelaw, dayîka Usman Hacî Mehmûd, Wezîrê berê yê Navxwe yê hikûmeta Herêma Kurdistanê, beşdarî kir.

Şanda Partiyê di hevdîtinek tevî Usman Hacî Mehmûd de, serxweşiya PDK Îranê bi wî birêzî ragihand.

Hêjayî gotinê ye ku hevjiyê daye Rehme Hemelaw bi navê Hacî Mehmûd û herweha kurek wê binavê Umer Hacî Mehmûd, di riya gihîştin bi armancên netewa Kurd de, şehîd bûne.

# Mehmûd Osman: Bila Erdogan xema pirsa kurd li bakûr bixwe





Endamê Kurd yê Parlametoya Iraqê Mehmûd Osman serdana Serokwezîrê Tirkiyeyê bo Herêma Kurdistanê bi giring da zanîn û daxwaz kir ku ev zêdetir hewla çareserkirina pirsa kurdan li Tirkiyê bide.

Mehmûd Osman di daxuyaniyekê de derbarê serdana Recep Teyyip Erdogan bo Bexda û Hewlêrê wiha got, "Serdana Erogan bo Iraq û Necefê bi wê merema bû ku Tirkiye û Amerîka naxwezin Îran zêdetir destêwerdana mijarên hundirê Iraqê bike, û Tirkiyê dixweze bo vê merema navcîtiya navbera Behreyn û dijberên wê bike".

Osman wiha pê de çû: "Armac li serdana bo Herêma Kurdistanê û vekirina balefirxaneya Hewlêrê ku 7'emîn balefirxane ye li ser asta cîhanê de, xurtkirina pêwediyên aborî ye û Tirkiye dixweze guhertina bazirganî li gel Iraqê bigehîne 20 milyar dolaran ku beşek zaf li Kurdistanê ye û hebûna 200 bazirganan bi Erdogan re nîşana wê ye ku serdan zêdetir bazirganî ye".

Mehmûd Osman destnîşa kir ku piştevanîkirina Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî li Erdogan bo hilbijartina dahatî nîşaneya rezamediya serokê herêmê li vê serdanê ye, lê tenê xala nîgtîv ev e ku Erdogan cardin PKK bi hêzek terorîstî bal ereban û di Parlamentoya Iraqê de da zanîn, her çend li Kurdistan basa hidê nekir, û bi Barzanî jî tenê got Serok, negot serokê kîderê, ji ber ku pêwîst nebû Erdogan behsa PKK li Iraqê bikira.

Dr. Mehmûd wiha destnîşan kir, "Çima dibe Tirkiye biçe li Lîbya, Behreyn, Kuweyt û Iraqê pirsgirêkan çareser bike, çima pirsgirêkên navbera Ereb û Îsraîliya çareser bike, çima pirsgirêkn xwe çareser nake, ev siyasetek dûrûyane ye".

Osman got ku ew di vê baweriyê de ne ku pirsa kurdan li bakur tenê li hundirê Tirkiyeyê çareser dibe ne li Bexda û Hewlêrê, lewma hêvî xwest ku Hikûmeta Tirkiyeyê bikare bi kurdên bakur re gotûbêjan bike û wan bi terorîst nede nas kirin, ji ber ku ev çend mehe PKK'ê tu operasiyonek çekdarî encam nedaye û çend car agirbest ragihandiye.

# Got û bêj Û Hewildan Di Pêxema Hevgirtinek Jêhatî De

## Gotûbêj ligel rêzdar Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê


**Hevpeyvîn: Sîrûs Melekûtî**

### Beşa duyem

Beşdarînekirina xelkê Kurd di refrandoma diyarîkirin cura hikûmetê û xebata wan dijî rejîma taze avabûyî û herwiha gellek ji helwest û siyasetên rojên destpêka desthilatdariya hikûmetê, hemû vê rastiyê nîşan didin. Lê mixabin ew dem bi sedemên zor, hişyariya han li nav netewên din ên Îranê de pêk nehatibû, lewara eva normal bû ku, daxwaza “xudmoxtarî bo Kurdistanê” ji PDKÎ re bes e. Lê di salên piştre, piştî derbazbûna çendîn salan û pêkhatina guhertinên berfireh û kûr ên cur bi cur, nemaze guhertinên siyasî li herêmê de ên wek nasîna rejîma Komara Îslamî ya Îranê û jordeçûna asta hişyariya netewên Îranê, ew daxwaza ku rojekê daxwaza xelkê Kurd bû û PDKÎ wek Partiya xweştevî ya piraniya xelkê Kurd, eyankerê vê daxwaziyê anku xudmoxtarî bû, bûye daxwaza gişt netewên Iranî. Xebata siyasî ya van netewan li Azerbaycan, Belûçistan, Ehwaz û...di van salane de serbarê hemû tepeserkariyên hovane yên rejîmê û pêkhatina partiyên van netewan bi awayek eşkere û nepenî li ser bingeha daxwazên netewî, eyankerê rastîn ên daxwaziyên han e û buxtankirinên wek girêdayîbûn bi biyaniyan, qaçaxçiyên madeyên hişber, terorîst û... ji Partî û çalakvanên siyasî ên wan, ji aliyê rejîma Komara Îslamî ya Îranê ve, nekariye tiştekê ji vê rastiyê kêm bike. Ku wusan bû ji ber ewê ku di dehsala yekem a hikûmeta Komara Îslamî de, hezek hêjayê balkişnadinê bo daxwazên netewî li nav netewên cur bi cur ên Îranê de nebûye, daxwazkirina xudmoxtariyê bo gişt netewên Îranê (hikûmeta federal li Îranê de) ji aliyê PDK Îranê ve ligel rastiyên ew demê yek nedigirt. Ji ber ku vê Partiyê ew maf ji xwe re berheq nedizanî ku bi nûneratiya netewên din ên Îranê biaxave û daxwazên wan bîne berbas, lê ev daxwazî hêdî hêdî – bi hinek sedeman ku me berê îşare pê kir- bû daxwaziya gişt netewên Îranê û hemûyan ev maf daxwaz kirin, lewra daxwaza avakirina hikûmetek demokratîk ya federal li Îranê bi armanca bidesthatina mafên siyasî ên netewên zilmlêkirî ên Îranê hate holê û bû dirûşma sereke ya PDKÎ. Ji vê dîtingehê ve em dikarin bibêjin ku daxwaziya xudmoxtarî li qonaxek dîrokî ya diyarîkirî de ji aliyê PDK Îranê ve ligel zirûfa siyasî û civakî ya vê demê yek digirt, her bi vî awayî jî cîgirtina dirûşma sereke ya federalîzmê ligel zirûfa siyasî ya îro a Îranê, netewên Îranê û herêmê yek digire.

Bila vê rastiyê jî zêdeyî sedemên baskirî bikin ku pêkhatina hikûmeta federal li Îranê de û hikûmetên xudmoxtar di herêmên netewî de bo netewên Îranê, dikare di bihêzkirin û berfirehkirina demokrasî li seranserê Îranê de rolek pir berçav hebe û herwiha wek gerentiya herî bihêz û cihê baweriyê bo man û parastina van xudmoxtariyan tê hesêb. Bi vê wateyê ku ger di zirûfekê de hikûmeta navendî ya Îranê xudmoxtariyê bo yek ji netewên Îranê bi fermî binase, her ev hikûmeta di zirûfek din de gellek bi senahî dikare bingeha vê xudmoxtariyê têk bide, lê ger netewên din ên Îranê jî xwediyê vî mafî bin, têkdan û hilveşandina wan hemûyan bo hikûmeta navendî ne ew qas senahî dibe.

Li vir bi hewce dizanim îşare bi vê yekê bikim ku Partiya Demokrat di heyamê ew salan de ku xudmoxtarî kiribû dirûşma xwe ya sereke, herdem li ser vê meselê jî pêdagirî kiriye ku di welatek wek Îranê de ku netewên cur bi cur her yek di herêmek coxrafiyayî ya heta astekê diyarîkirî de dijîn, fedralîzm baştirîn sîstema hikûmetî ye. Derheq beşa duyem ya pirsyara we diviya bibêjim ku heta di hilbijartina dirûşma federalîzmê de jî “demokrasî bo Îranê” dîsan ketiye pileya yekem de. Ji ber ku di kongireya 13 a PDKÎ de, pirsa federalîzmê bi vî awayî hatiye baskirin: “dirûşma stratijîk ya PDK Îranê, damezirandina sîstemek demokratîk a federal li Îranê de û dabînkirina mafên netewî bo netewa Kurd di Kurdistana Îranê de ye.” Dariştina çemka “sîstenmek demokratîk ya federal” bi balkişandin bo ser vê rastiyê hatiye hilbijartin ku demokratîkbûna sîstemê li serweyî armanca me ye û bi tu awayekê nehatiye jibîrkirin. Ji ber ku demokrasî li her zirûfekê de li serweyî armancên din ên xebata Partiya Demokrat de bûye û heye.




**Rêzdar Hicrî, we îşare bi pirsa federalîzmê kir, ewa ku federalîzm li Îranê de gerentiya demokrasî û herwiha parvekirina desthilata siyasî dibe. Her di vê pêxemê de renge qebûl dikin ku pirsa parvekirina desthilata siyasî û piştkirin ji sîstema santiralîstiya siyasî-kultûrî dikare rêyên cur bi cur hebe û dibînin ku rêzbendiya nêrînên siyasî ên hêzên siyasî û hizrî li Îranê de bi awayekê ye ku dabeşkirina desthilata siyasî dipejirînin, lê alternatîvên cur bi cur jêre pêşniyar dikin. Her di vê pêxemê de dixwazin çend pirsiyaran bikin. Gelo federalîzm tenê alternatîva kêrhatî ye bo dabeşkirina desthilata siyasî?**

Ezmûna desthilatdarî di sedsala borî li Îranê de nîşan daye ku totalîtarîzm li naved de wek palhêzek bihêz bo tepeserkirina daxwazên netewî ên netewên Îranê û yek ji wan xelkê Kurd mifah jê hatiye wergirtin. Ev siyaseta serbarê guncandina hinek xalên cihê pesend û bi awayek rûyekî demokratîk di yasaya bingehîn a welat de bo herêmên netewî yên Îranê wek liberçavgirtina hinek maf ji wan re, bi awayek berdewan mifah jê hatiye standin.

**curek ji hizra siyasî, xwendinek negotî lê ron derheq daxwazên we bas dikin. Ew hizra siyasî serbarê rêzgirtin ji bûna Kurd, vê gumanê diçînin ku daxwaza federalîzmê hêcetek e ji bo cudabûnê. Ev bangeşeya îrorojê kariye li hizra beşek ji xelkê Îranê şik û gumanê derheq federalîzmê çêbike û beşek ji xelkê ligel xwe hevdeng û hevrê bikin. Buxtan lêdan derheq daxwazên Kurdan, bêşik dikare hestek du aliyane li hizran de çê bike. Her çawa be ev hêza hizrî renge li hizra çepgir ya demokratîk de jî bihê peydakirin, rast ew hizra ku daxwaza nemana sîstema santeralîzmê dike, bersiva we çiye?**

Di Îranê de ku li hemû dîroka xwe de demokrasî bi xwe ve nedîtiye, bi dirêjahiya çendîn sedsalan û nemaze di nîv sedsala derbazbûyî de ferq û cudahîdanîn û zilm û zordarî kirin ne tenê li kiryar û hizra desthilatdaran de, belku di hizra girûpek ji wan kesên ku bangeşeya demokrasî û yeksaniyê jî dikin, û bi xwe jî li jêr zilm û ferq û cudahiyên desthilatdaran de ne, ew qas bihêz bûye ku şiyana xwe rizgarkirin ji berhemanîna zilmkirin û pêkanîna ferq û cudahiyan nînin, ku wusan e tenê federalîzm e ku dikare netewên zilmlêkirî piştrast biket û pêşeroja wan yas siyasî bo mafên yeksan ligel hemûyan di çarçoveya Îranê de gerentî bike, netewên akincî ên ser erdê Îranê ên weku me anku netewa Kurd, ku di zirûfên hestyar û girîng de, gelek bi bejna me gotine û sitayşa me kirine, bo nimûne dibêjin Kurd Ariyayiyên resen in, sînorparêzên xwedî xîret in, welatparêzên netirs in û..., lê ger her ev netewa ku ew taybetmendiyane hene, rojekê daxwaza mafê xwe yê herî destpêkî û mirovî wek xwendina bi zimanê zikmakî bikin, zû dibin cudaxwaz, dijî şoreş, kirêgirtiyên biyaniyan û..., û bi buxtana van tawanên ku qet encam nedane, tên sizadan. Di van buxtanpêkirinan û dana sizadanan de, tu cudahiyek navbera grûpa ku daxaza demokasî û yeksanxwaziyê! dikirin ligel ew rejîma totalîter û serberedayî nebûye. Her bi vê sedemê û gellek sedemên din, ji dîtingeha me ve fedralîzm tenê



alternatîvek kêrhatiye bo dabeşkirina dadperwerane a desthilata siyasî li Îranê de. Ew hêza hizrî ku hûn bas lê dikin, her ew hêza hizrî ye ku bi awayek rûyekî demokrat in ku teoriyên pir zêde dadirêjin û di gellek rêyên zîgzagî de dimeşin daku bikarin rojekê ew basên xwe ên derheq vêdebirina ferq û cudahiyan ku bi neçarî bas jê dikin, di pêşerojê de û piştî bidestgirtina desthilatê, herdem ku bixwazin bikarin bi kiryar, bixin pişt guhê xwe û rê ji bo sepandina zordariya veşartî ya nav mêjiyê xwe de xweş bikin. Ger wan bi rastî bawerî bi federalîzmê hene, ji ber çi dest nadanin ser şêwazekê ji wê ku rezamendiya netewên Îranê li pey xwe bîne û hemûyan bi qasî hev bike xwedî û dilsozê vî welatî?

**Lê li hember vê hizrê de, hêzek hizrî jî heye ku daxwaza federalîzmê dike. Îrorojê pitir hêza civakî ên wek hizirmendan, federalîzmê wek tenê rêya betalkirina desthilata santralîzmê dibînin, lê çavaniya avakirin û cura têgihîştina wan derheq federalîzmê, dibe ku bibe sedema anîneberbasa alternatîvek cudatir, wek federalîzm li ser bingeha cuxrafî- parêzgehî û federalîzm li ser bingeha cuxrafiya kultûrî-zimanî. Erê gelo pesendkirin yan redkirina her yek ji wan baweriyan pêwîstî bi karê karnasane di biyava nirxandinên kûr ên warên aborî-siyasî û kultûrî de nine? Ger bersiv erênî ye, di nêrîna ve de me çi datayek bo pesendkirin yan redkirina van altêrnatîvane li berdest de hene?**

Ji aliyekê ve cihgirnebûna demokrasiyê ku beşek ji wê vedigere bo neceribandina wê li welatê me de –heta di hizr û mêjiyê girûpek ji wan aliyên ku bangeşeya demokrasiyê dikin- û ji aliyek din ve ezmûna federalîzmê li gellek welatên demokratîk û pêşkevtî yên îro ên cîhanê de ku pêkhata nifûsa wan ji netewên curbicur ên akinciyê cuxrafiyayek diyarîkirî ya wî welatî de pêk hatiye û gellek sedemên din bûne sebebê ewê ku federalîzm tenê alternatîvek demokratîk û cihê baweriyê be bo netewên Îranê. Ev şêwaza rêvebirina welat, helbet di welatên din de pêka xwendinek karnasane hatiye hilbijartin û gellek sal e ku bi kiryar tê rêvebirin û gellek ezmûnên baş di vê pêwendiyê de li berdest in. Niyeta min ne ew e ku em bên û federalîzmê li cihek din kopî bikin û di welat de damezirînin, belku bi parastina bingeha vê ezmûna serkevtî, bi awayekê di welatê xwe de damezirînin ku bersivderê taybetmendiyên Îranê be, helbet di vê beşê de me pêwîstî bi karê

**Rengê hindê dide pêvajoya gotûbêja siyasî ya navbera hêzên hizrî û siyasî, yan dest pênekirye yan zêdetir xwe mijûlê tiştên ne sereke ên pêwendîdar bi wan berbijar û altirnatîvan kirine. Bo wê ku gotûbêjên han bi awayek micid were hole, we çi kiriye û we çi bernameyak bo pêşerojê heye?**

Pêvajoya gotûbêja siyasî li ser Îrana federal bi berhevdan ligel salên despêkîn ên hikûmeta Komara Îslamî ya Îranê nemaze di dehsalên borî de, pêşkevtinek zêde bi xwe ve dîtiye, niha beşek zêde ji çalakvanên siyasî ên netewên Îranê di vê derbarê de basan pêşkeş dikin, mijaran dinivîsînin û civînan lidar dixin. Çend sal beriya niha hinek konferans li zanîngehên Qezwîn, Tewrêz û Tehranê ji aliyê mamosta û xwendekarên netewên Îranê nemaze Turkên Azerbaycanê rêve çûn û têde piştevanî ji federalîzmê kirin. Li derveyî welat de jî çalakiyên berçav yên siyasî ji aliyê rewşenbîr û grûpên siyasî ên federalxwazan û hemû ew kesên ku bîr ji pêşeroja Îranek aram û pêşkevtî dikin û bawerî bi dirûşma "Îran bo hemû Îraniyan" hene, berdewam e. "Kongireya Netewên Îrana Federal" ku nûnerê hizrî yê piraniya netewên Îranê ye, di gellek beşên civaka navnetewî de tên piştevanîkirin. Me di vê pêxemê de hewlên xwe ên teşkîlatî, ragihandinî û pêwendîgirtin bikar xistiye daku bi hevkariya çalakvanên din ên siyasî ên bawermend bi federalîzmê, vê gotarê bi awayek micidtir û berfirehtir ber bi pêşve bibin. Karên Partiyê di vê pêxemê de xwedî bandor bûye û renge her bi vê sedemê be ku di van rojane de totalîtarîzma desthilatdar û bindes ji çepgir û rastgiran, zêdetir ji berê dest bi êrîşkirin bo ser çalakvanên federalîzmxwaz ên wek Partiya Demokrat. Di bernameya me de ye hevdem ligel hêzên din ên bawermend bi demokrasî û yeksanî di pêşerojê de di pêxema pêkanîna zirûfek baştir bo têgihîştin ji vê pirsê ligel welatiyên xwe de înca ser bi her hizrekê bin, dest bi gotûbêjê bikin.

**Min di yek ji hevpeyvînên xwe de ligel we pirsek derheq pêvajoya dabînbûna alternatîva siyasî ya we ku Îranek demokrat û federal e, anî holê. Bersiva we ron û eşkere bû. We got ku hûn daxwaz û alternatîva xwe ya siyasî ji rêya xebata siyasî û demokratîk û refrandomê pêş dixin. Niha car din dixwazim vê pirsê bînim berbas ku ger ew daxwazkariya ji rêya refrandomê ve nehê pesendkirin, dê siyaseta Partiya we çi be?**

Helbet rêya me bo gihîştin bi vê daxwaza siyasî domandina xebata siyasî û demokratîk û piştre refranom e, lê refrandom li ser diyarîkirina çarenivîsa neteweyekê, diviya her di nava wî netewî de bihê encamdan. Ger di vê refrandomê de netewa armanc – bo mînak Kurdên Îranê- sîstema fedralîzmê red bikin, bê şik Partiya me dê pêrewê ji dengê piranî bike. Lê ger armanca me encamdana refrandomê be li nav hemû xelkê Îranê derheq Kurdan, bi vê wateyê ku hevwelatiyê min li Şîrazê li ser Kurdên Kurdistana Îranê yan Turkên Azerbaycanê biryar bide û deng bide û yan berewajî, ez refrandomek han ne bi demokratîk dizanim, ji ber ku eger heye refrandomek han tu guhertinek derheq zirûfa nebaş ya netewên Îranê pêk neîne, anku dûbarebûna hemen zirûfê û destpêkirina qonaxek nû ji xebat di pêxema bidestxistina mafên siyasî de. Diviya refrandom li nav netewên Îranê de bê encamdan, bo mînak di dawiyê de eva xelkê Kurd e ku mafê diyarîkirina çarenivîsa xwe hene û çavaniya rêvebirina welatê xwe diyarî dikin.

**Hin pirs hene ku pêwîstî bi refrandoma giştî hene. Bo mînak dema derbarê sîstema demokratîk a pêşerojê diaxivin, biryardan li ser wê dikeve çarçoveya yekîtiyek netewî de. Pirsa min rast bi vê wateyê ye ku ger xelkê Îranê deng bidin sîstemek demokratîk û ne navendî, lê ne fedralîzm jî, helwesta we ya siyasî çi dibe?**

Em pêşwaziyê dikin ji dengdana xelkê derheq sîstema demokratîk û ger ew sîstema demokratîk daxwazên me dabîn neke, wê demê emê ji demokratîkbûna sîstemê bi armanca gihîştin bi daxwazên xwe ên din, mifahê bistînin, her wek hemû xelkê civak û netewên din yên Îranê. Ku wusan e dabeşkirina desthilata navendî di her şêwazekê de –ku me îşare bi hin ji wan kir- ku xelkê din di rêveberiya kar û barên welat de beşdar bike û asta ew zilm û ferq û cudahîdanînan dijî netewan û welatiyên Îranê kêm bike, evane hin gav in ku me ji armancên xwe nêzîk dike. Lê renge bes nebe, lewra diviya ew rêya ku maye bo gihîştin bi armancên me yên dawî, derbas bikin.

**We îşare bi Kongireya Netewên Îrana Federal kir, ku di vê pêwendiyê de bê guman dengên giştî, bi awayên cur bi cur difikirin. Kongireya Netewên Îrana Federal ji Partî û hêzên cuda li seranserê Îranê de pêk hatiye. Xincî Partiyên Kurdistanî, partiyên din tu derbazbûyek derheq xebat û tu sened û nîşaneyek derbrê hebûna pêgeha xwe di nav xelkê xwe de naxin berdest me, hejmarek zêde ji van partiyan hevdem ligel avakirina kongirê bo yekemîn car hatin nasîn û her di vê heyamê de jî nekarîne pêwendiyek organîk ligel xelkê xwe de pêk bînin. Lê bêguman karîn bala hinek ji dezgehên cîhanî ber bi aliyê xwe ve rakêşin. Gelo kongire li ser bingeha rakêşana bala dezgeh û navendên cîhanî hatiye avakirin? Her di vê pêxemê de Partiya we Kongire û alternatîva xwe ya siyasî li ser hevpêwendî ligel Kongireya Netewên Îrana Federal daniye. Gellek ji wan hêzên siyasî ku her niha jî ligel we ne, bawerî bi vê alternatîvê nînin. Ev zirûfa han ya çendalî çawa dikare rêyek rohn ji xebatê pênase bike?**

Li pêwendî ligel Kongireya Netewên Îrana Federal û saziyên endam têde, diviya bibêjim ku hebûna dîroka derbazbûy ya xebatê, bo Partiyan wek pêwîst nabe sedema hebûna pêgehek xelkî bo van Partiyan, heta em dibînin partiyên kevn ên Îranê niha kêmtirîn pêgeha di nava xelkê de hene û berevajî jî rast e û ew jî ew e ku em di cîhan û Rojhilata Navîn de gellek Partiyên taze avabûyî nas dikin ku di her warekê de li pêş partiyên kevavabûyî ketine. Bidestxistina pêgeha civakî bo hizbekê vedigere bo çavaniya çarçoveya hizrî û bernameya karî ya

www.arsivakurdi.org

wê hizbê. Li Kurdistanê de kêm nebûn ew hizbên ku bi zorî xwe bi pêşkevtî dizanîn û bi çavek sivik mêzeyî Partiyên Kurdî ên bitementir ji xwe dikirin, lê ji ber ku hilgirê daxwazên xelkê nebûn, hêdî hêdî ketin nava bîranînên dîrokê de.


Derheq partiyên netewên din ên Îranê jî, zirûf her wusan e. Partiyên endam di kongirê de alaya xebat bo mafên netewên xwe girtine dest xwe ku bi dirêjahiya dehan sal li jêr her cure zilm û zordariyekê de bûne, ku wusan bû tu sedem tune ku wan li nav xelkê de pêgeha civakî nebin. Ez li ser vê baweriyê me ku her yek ji wan kêm yan zêde ligel xelkê xwe pêwendiya organîk pêk anîne, lê nabe em çavnihêr bin ku ev pêwendiyane wek pêwendiyên hinek partiyên Kurdistanî ligel xelkê xwe bin, ji ber ku ev pêwendiya li Kurdistanê de li heyamê çendîn salan ji kar û xebat û tekoşînê pêk hatiye. Li demekê de aliyê kêm hinek ji partiyên Kongireya Netewên Îrana Federal derheq dîroka xebatê, dîrokek ne ew qas dirêj hene, lê bi derbazbûna dem, kar û tekoşînê, pêwendiya wan jî ligel xelkê xwe hêdî hêdî berfirehtir dibe.

**Partiya we di zirûfek aloz de ye, ji aliyekê ve li hember rejîmekê sekiniye ku jinavbirina vê partiyê ji xwe re kiriye armanc û xwe ji tu cînayet û terorekê dijî wê dûr naxe, ji aliyek din ve ji aliyê hinek siyasetvanan ve berbirûy tirsandin û buxtanên wek cudahîxwazî bûye û ji aliyek din ve berbirûyê hêzek hizrî bûye ku herçend kêm in, lê li nav rewşenbîr û çalakvanên Kurd de hene û alternatîva serbixweyî xwe re kirine armaca sereke. Hûn zirûfa xwe çawa dinirxênin? Herwiha çi siyaset û gotarekê di nav van meydanên curbicur de pêşniyar dikin?**

We di vê pirsê de dest daniye ser çend xalan ku partiya me berbirûyê wan hatiye, berbirûbûn ligel rejîmekê ku partiya me bi helweşandî ragihandiye û her cure çalakiyekê li jêr vî navî de bi tundî tepeser dike. Xebat dijî vê rejîmê yan van rejîman bi armanca bidestxistina mafên siyasî û demokratîk bo xelkê Kurdistana Îranê, erkê dîrokî ya Partiya Demokrat e. Ev xebata bi dirêjahiya 65 salên borî serbarê hebûna çendîn asteng û kospên ser rê, dîsan jî her berdewam bûye. Domandina vê rêbazê heta gihîştin bi armancên herî dawî her dê berdewam be û hemû endam û alîgirên PDK Îranê her wek derbazbûyî vê rêkê diqetînin. Helbet ew kesên ku têne navrefên vê rêbazê de, agehdar in ji kosp û astengên wê, her lewra serbarê dijwariya rêkê, têgihîştin ji zirûfê ji wan re ne dijwar e. Herwiha ewa ku hejmarek ji çalakên Kurd alternatîva serxwebûnê liberçav girtine, zêdetir vedigere bo siyaseta tepeserkirin û ferq û cudahîdanîn derheq gelê Kurd û her qas ev tepeserkirin û pêkanîna ferq û cudahiya zêdetir be, ew qas jî hêza piştkirin û silbûn û dûrkevtin ji navendê, zêdetir dibe. Em serbarê rêzgirtin ji nêrînên han, li pêwendî ligel "mafê diyarîkirina çarenivîsa netewan" daxwaza hikûmetek demokratîk û federal li Îranê de dikin û lewra ji aliyê grûpa han jî rexne ji me hatiye girtin, lê serbarê wan hemû pirsan jî, hêj li nav Kurdên Îranê de daxwaza xudmoxtarî ji bo Kurdistanê di çarçoveya Îrana Federal de zal e. Me tu dijberiyek li gel van helvaên xwe nîne, belku em rêz ji bo nêrîn û dîtina wan digirin. Lê ewa ku hinek ji welatiyên me daxwazên me yên siyasî û demokratîk bi cudahîxwazî dizanin û di vê pêxemê de buxtanên nehêja û neheq ên cur bi cur dixin pal gelê me yan partiya me, vedigere bo xirabtêgihîştina wan ji demokrasî û desthilata navendî. Lewra hêvî dikin ku pêşkeşkirina ronkirinên zêdetir ji aliyê me û alîgirên din ên hikûmeta federalîzmê, xirabtêgihîştinên han nemînin û bigîjne wê rojê ku tu yek ji me xwe ji yên din bi Îranîtir nezane û li ser domandina ferq û cudahîdanîn û zilm û zordariyê dijî Kurdan û netewên din ên Îranê pêdagirî û tekez nekin û nebin hevdest û hevrêbazê rejîmên totalîtêr. Li vir de pêwîst e ku îşare bi vê rastiyê bikim ku berfirehbûna buxtanên han derheq Partiya me, zêdetir nîşaderê berfirehbûna roj bi roj ya heza pêkanîna Îranek demokratîk û federal li nav azadîxwazan û welatparêzên rastîn ên Îranê de ye daku bo herdem dawî bi wan ferq û cudahiyan were.

**Di wan salên dawî de ligel geşekirina hizrî ya netewên Îranê li ser bingeha bawerhebûn bi hebûna xwe ya dîrokî û mirovî û geşekirina roj bi roj ya hişyariyê di pêxema bidestxistina yeksanî di warên civakî, aborî û kultûrî ve, curek ji hizra dîroksazî û jihevdu cudakirina bingehan û behayan pêk haitye. Hinek xebatê di pênaseya nejadî, zalbûn ya bindestbûna kultûrî ya yekî dîn de dibîne. Êrîş dikin ser bingeh, hêma û behayên kultûrî û zimanên hevdu daku bi vî awayî li ser heqbûna xwe bidin îsbatkirin. Çemkên wek panfarsîzm, Farsên faşîst, Farsên dagîrker û şovînîzma Fars, wanê dibine destewajeyên rojane ên gotûbêjan. Di rastî de xala yeksanxwaziya kultûra siyasî ber bi dijekultûriyê dimeşe. Min şik û guman têde nîne ku beşek ji hêza bizvêner ya vê riftarê vedigere bo kiryarên rejîmê û dezgehên wê yên sîxoriyê. Lê beşek din ya wê, pêwendî bi me heye û ji me re vedigere û eva ku em hestên xwe ên hatinî tepeserkirî dixin cihê rastî û hizra xebatkarane. Bi baweriya min nêrînên han hem dibe sedema dudiliyê û hem hizrek yekgirtî bo xebat dijî Komara Îslamî ya Îranê sist dike. Partiya we tu carê di tu basên han de beşdar nebûye û hemû hewl û tekoşîna xwe bo yekitiya siyasî bikar aniye. Lê hûn ne li ser vê bawerê ne ku xebata we di vê pêxemê de kêm bûye û diviya we berbirûbûn dijî têgihîştinên han ên xirab xistiba nava bernameya xwe de? Di vê derbarê de hûn çawa bîr dikin û we çi pêşniyarek heye?**

Partiya me wek partiyek yeksanxwaz bi çavê rêz ve mêzeyî kultûr, ziman, dîrok û dîtin û nêrîna olî yên hemû welatiyên Îranî û ne Îranî dike, li ser vê bingehê bi dirêjahiya heyamê xebata me dijî ferq û cudahiyan, herdem me li nav endam û alîgirên xwe de bo vê kultûrê teblîxat kiriye. Hikûmeta 11 mehî ya Komara Kurdistanê li Mehabadê li sala 1946'an de senedek bihêz e bo îsbatkirina vê baweriyê. Kultûra partiya me di destpêkê de heya niha li ser bingeha pêkanîna yeksanî û wekhevî bûye, lewra em ku di pêxema dabînkirina vê yeksanî û wekheviyê de xebat dikin, dixwazin ku tu cur xwe li serve zanîn nemîne daku em hemû bihev re bin, nek ewa ku em xwe zêdeyî xelkê din bizanin. Renge li nav hinek ji welatiyên Fars û netewên din ên Îranî de, kêm û zêde nêrînek şovînîstî hebe, lê nêrînek han bigiştî mehkûm e , ji ber ku dibe asteng li hember rêya bihevre jiyana netewan li Îranê de. Ji dîtingehekê ve bikêmzanîna nejad ya kultûrek din tu car nabe sedema jordeçûna kultûra êrîşkeran. Dijî kutûrbûn, bi kêmzanîna xelkê din û mafê taybetî ji xwe re bi berheqzanîn, ligel yeksanxwazî û nemana ferq û cudahiyan de dijberî heye, lewra em vê yekê mehkûm dikin. Di xurtkirin û berfirehkirina vê dîtingehê de, partiya me karê bê veqetiyan û berfireh encam daye, renge her bi vê sedemê jî be ku li nav Kurdan de bi kêmzanîn û bêhurmetîkirin, kêmtir tê dîtin li berhevdan ligel netewên din ên Îranê, lê bo berfirehkirina rêzgirtin ji hevdu û bihadan bi kultûran, pêwîstî bi



karêz zor û berdewam ê, lê bo berfirehkirina rêzgirtin ji hev û bihadan bi kultûran, pêwîstî bi karê zêde û berdewam yê hemû rewşenbîr û çalakvanên siyasî yên demokrat li sernanserê Îranê de heye, ji ber ku Komara Îslamî ya Îranê bi bikaranîna siyaseta tundûtûjane û ferq û cudahîdanînan, mijûlê pêkanîna nifaq û dijminayetê ye li navbera netewên cuda cuda yên Îranê de.

**Nifşa ciwan ya Îrana îro, bê şik gellek cudahî ligel nifşa xebatkar ên berê xwe heye. Yek ji aliyên diyar û taybetmendiyên nifşa ciwanên îro, takekesgerîtî ye. Yekî din ji taybetmendiyan, beşdarîkirina wan e di meydana zanîn û zanistên akademîk de. Bi raya we PDK Îranê heta çi astekê kariye ligel vê nifşê de pêwendî ava bike? Gelo daxwazên nifşa nû ya gelê Kurd ji hizra Partiya we hatiye wergirtin? Di bingeh de hûn pêgeha niha ya Partiyê di nava grûpên temenî û ciwakî ên cuda de çawa dinirxînin?**

Pirsek balkêş e, nifşa ciwan ya gelê Kurd hez û meylek zêde derheq xwendina akademîk û pêşkevtî heye, gellek ageh û xwedî kultûr in. Ger şaş nebim hejmara xwendekarên Kurd li Îranê de li gor nifûsê, xwediyê hejmarek zêde ye û her eva jî bûye sedem ku ger xelkek li nav nifşa berê de bi awayek sozdarî ve li pey bidestxistina mafên xwe yên siyasî bûn, nifşa niha bi hişyarî û fehmek zêdetir û hizirîn ve gav di pêxema bidestxistina van mafan de avêtine, çalakiyên berçav ên xwendekarên Kurd di zanîngehên Kurdakincî û bajarên din yên Îranê de, belgeyek bihêz e di vê derheqê de.Mirov dikare yek ji sedemên vê rastiyê di zirûfa pir ji ferq û cudahiyan û bêhurmetiyan de bibîne ku rejîma Komara Îslamî ya Îranê derheq gelê Kurd û nemaze vê nifşê pêk aniye. Nifşa ciwan û xwendevan a îro ya gelê Kurd ku dema çavê xwe vedike, dizane ku xwendin bi zimanê dayîkî jê hatiye qedexekirin, baweriyên wî\wê yên olî bi awayek rojane bêhurmetî jê tê kirin.

Bi sûça Kurdbûn û Sunîbûnê ketine perawêzê û welatê wan pare maye, desthilatdarên welatê wan li Tehran û Îsfehan û... de hatine, ji ber ku Kurd ne kêrhatî û hêjayî rêvebirina welatê xwe ne?! û wek kesên ku hêtîm in û paremayî ne ji warê hizrî ve, diviya ji aliyê kesên serwetir ve bên serperestîkirin!, dema daxwaza azadiyê dike, dijî şoreş in!, ger daxwaza kêmkirina sîvera ev serperstiya bi zorî sepandî bikin, cudahîxwaz e! û herdema ku ji ber birçîbûn û bêkariyê dengê xwe bilind bike, girêdayî bi "îstîkbar" û biyaniyan e! û bi buxtanên cur bi cur diviya bên îdamkirin yan zîndanîkirin, Çawa dibe çavnihêrî bê kirin çavkaniya van hemû êş û azaran ji bîr bike û li hizra takekesiya xwe de –ligor nirxandina we- be? başe ma ne wusan e ku ew seba Kurdbûna xwe ketiye ber gef û êrîşên bêrehmane ên grûpek paremayî? Ku wusan e ew bi hinceta takekesgerayiya xwe ya azad jî be, gellek bi hişyrî ve ev rastiye zaniye ku bo gihîştin bi kesayetiyek azad, beriya her tiştê diviya xwe li jêrdestbûnê de rizgar bike û wek ciwanek Kurd xwe nîşan bide û ew destên ku dixwazin wî\wê bê şunas bikin û bikin pêç û more, vêde bide û her bi vê armancê ye ku tê nava saziyan û tevlî xebatê dibin. Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê ji ber ku her di destpêkê de heta niha bê tu şik û gumanekê azadiya takekesî û bidestxistina xudmoxtariyê bo gelê Kurd, wek armanca sereke dibîne û di her zirûfekê de alahiligirê rastîn a xebatê bo bidestxistina van mafan bûye, piraniya xelkê Kurd li devra xwe kom kiriye. Xebata han û li pêşgirtina vê siyasetê, niha jî pira pêwendiya navbera vê nifşê ligel Partiya Demokrat e. Xincî vê yekê jî daxwazên din ên demokratîk yên vê nifşê di bername û stratijî û taktîka Partiyê de bi ronî hatiye bas kirin. Basên han û xistine berbasa van rêçareyan, ne pirsên ew qas aloz û tevlîhev in, ku pêwîstî bi dabeşkirin bo ser pêş û paşxistina demokrasiyê hebe. Li ser bingeha van nêrînan, armanca herî sereke ya gotara siyasî ji me re, bi fermînasîna van mafên rohn û naskirî ne. Ji ber ku ev bi fermî nasîne, xala destpêk a gavavêtin bo demokrasiya rastîn, pêkanîna Îranekê bo hemû Îraniyan û aştiya netewî ye. Rêyek ku berevajiyê wê di sedsala borî de nekariye Îranek yekparçe- bi zora sernîzê- çê bike û bibe pirekê baweriyê navbera hemû netewên Îranê de.

# Ji gotinê heya pêgavên bi kiryar



Ebdulla Hicab

Diyarî kirina raporterê taybet ji bo çavdêriya Mafên Mirovan li Îranê ji aliyê Konseya Mafê Mirovane Neteweyên Yekgirtî ve pêgavek erênî û di ciyê xwe de bû. Lê weke gotina kevnare ya Kurdî dibêje: "Hezar gotin nabin kirinek", bi tenê destnîşan kirina raporterekê bi serê xwe nikare karîgeriya erênî li ser rewşa mafê mirovan li Îranê daynê. Ji ber ku çvkaniya avê bi xwe şêlûye, her karê ku civaka navneteweyî di warê mafê mirovan de li Îranê bike, heya dema ku pêgavên bi kiryar li gel nebin wê ne tewaw be.

Di salên borî de hem rêkxistinên parêzerê mafê mirovan û hem jî çavdêrên navneteweyî bi çavên xwe dîtin ku çawan Komara Îslamî, bêy ku guh bide meraqên wan di derheqa rewşa mafê mirovan de, bi awayek berfireh mafê miroavn binpê dike. Her du raporterên ku berê ji aliyê Komisyona Mafê Mirovan ya wê demêye Neteweyên Yekgirtî ve, ji bo Îranê hatibûn diyar kirin, Gallin De Paul û Moris Capitorn ji ber astengiyên dewleta Îranê nekarîn bi awayek cidî çavdêriya rewşa mafê mirovan li Îrane bikin. Di encamê de karê wan nekarî tu sûdê bidin rewşa mafê mirovan.

Wê carê, karbidestên Neteweyên Yekgirtî u welatên ku piştgirî dan pêşniyara destnîşan kirina raporterê taybet ji bo çavdêriya mafê miroavn li Îranê hêvî dikin ku astengiyên ku Îran li ser riya xebata reporter çê bike nikare karê reporter bisekinîne. Eger bê û ev gotin bi cî bê, renge karê raporterê nû ji karê ku raporterên pêşîn meşandin hinekê serketîtir be, lê ji bo ku ev kar encamekê bide, pêwîste ku şêweya nêzîkbûna Neteweyên Yekgirtî û Konseya Mafê Mirovan li ser Îranê ji bingeha xwe ve bê sererast kirin.

Komara Îslamî yek ji wan dewleta ye ku piraniya binpê kirinên mafên mirovan li gor yasayan dimeşîne. Girtin, eşkence, kuştin, berdbaran an recim, qut kirina dest û lingan, lêdana zarokan, destdirêjî, bêhurmetî kirin u hemû şêweyên din yên binpê kirina mafên Mirovan li Îranê li gor Yasaya Bingehîn û yasayên din têne birêve birin. Ji pêşgotin û 175 xalên Yasaya Bingehîn ku sala 1979 hate pejirandin û sala 1989ê 2 xalên din jê zêde bûn û bi giştî bûn 177 xal, 140 xal ji bingeha xwe re bi pîvan u prensîpên mafên mirovan re dijberî hene. Bi rêje, ev yek dibe 80% xalên Yasaya Bingehîn ku ji xwe astenga ser riya mafê miroavne. Xên ji wê hindê, Yasaya Kar, Yasaya Malbatê, Yasaya Sizayên Îslamî û hemû yasayên din ji bingeh re li dijî mafê mirovan û wan pîvanan hatine amade kirin ku niha Neteweyên Yekgirtî bi hêvî ye heya Îran wan biparêze.

Di gel wan astengiyan jî, hin pêgavên bi lez ku dikare alîkar be heya raporterê taybete Çavdêrê Mafê Mirovan di karê xwe de pêşketinê bi dest bixe evin:

- Derfet neyê dan ku rejîma Îranê rewşa mafê mirovan bi mijara ewlekariya niştîmanî ve girê bide û bi hêceta parastina ewlekariya welat, mafê endamên civakên derveyî bazneya deselatê, weke mafê Kurd, Belûç, Ereb u yên din binpê bike. Ezmûnên ku heya niha li ber çavin, nîşan didin ku Komara Îslamî li wî milî ve heta Yasayên xwe jî binpê dike. Carna bi hêceta parastina serweriya neteweyî, car bi hêceta parastina asayişa welat û car bi hêceta parastina berjewendiyên rejîmê, Komara Îslamî her dema ku xwestibe mafê endamên neteweyên bê mafe welat binpê dike. Lewma em dibînin ku hejmara herî zêde ya darvekirinan li Kurdistan, Belûçistan û Ehwazê têne encamp dan. Li wan herêman, ji eşkence, girtin, wenda kirin, bêhurmetî kirin u şikandina kerameta mirovan re jî tu sinûr nînin. Dema Neteweyên Yekgirtî û Konseya Mafê Mirovan mekanîzmek ji bo neçar kirina rêjîma Îranê bo guherîna wê piratîkê dît, tenê wê demê biryara nû dikare hinek karîgerî hebe.
- Pêgavek din ya bi karîgerî ku dikare alîkar be heya karê raporterê nû bigehe encamên pêwîst ewe ku raporter u dezgehên ser bi NY bi giştî bi xwediyê doza mafê Mirovan li Îranê re bi awayek rasterast bikevin dialogê. Giringe agahdariyên ku raporter bi riya xwediyê dozê re, ku rêkxistinên mafê mirovan û parêzvanên mafê neteweyên bindeste Îranê weke Kurd, Belûç, Turkmen, Azerî, Ereb û Farsin bi dest dixe bi cidî bigre u kar li ser wan bike. Rêkxistinên opozisyona Kurd, Belûç, Ereb, Turkmen, Azerî û hwd li herêmên xwe aktorên sereke ne. piraniya kesên ku tên girtin, eşkence û îdam kirin, endam û alîgirên wan rêkxistin û komelane ne. Bêy ku dialogek vekirî bi wan rêkxistinan re çê be, ne agahî û raporên li ser rewşa mafê miroavn tên tekûz dibin û ne jî xerîteya mafê miroavn li wan herêman tê çê kirin. Yek ji kêmasiyên herî mezin ku her du raporterên pêşîn hebûn ev bû ku îmkana diyalog bi gelên derveyî bazneya deselatê li Îranê re pêk neanîn. Piraniya karê wan li girtîgehên navendî li Tehran û wan bajaran bû ku di navenda Îranê de ne û girtî jî piranî ew kes bûn ku rejîmê bi xwe rê dida bi raporteran re bikevin têkiliyê. Ew kar kêmasiya herî mezin bû ku rê neda tu gav wêneyek rast ji rewşa mafê miroan li Îranê derkevê holê.
- Xalek din ya sereke ku Konseya Mafê Mirovan pêwîste guh bidê, çarçoveya yasayên Îranê ye. Bi hin guhertinên rûkeş û kosmêtîk re ku di renge kiryar û reftara rêjîmê de pêk were, rewşa mafê mirovan li Îranê baş nabe. Neteweyên Yekgirtî û welatên ku xwe girêdayî pîvanên mafên mirovan dihesibînin pêwîste zextê bidin Îranê heya yasayên xwe yên ku bi pîvanên mafên mirovan re dijberin biguhere. Bi wê re girêdayî, bi awayek automatîk rewşa siyasiye Îranê û çarçoveya biryar û karên sîstema deselatdar tê rojevê. Sîstema navneteweyî nabe ji hindê bisilike ku Îran wê tawanbar bike ku bi rojevek siyasî nêzîk pirsa mafê mirovan li Îranê dibe. Ji xwe hemû mafan çarçoveyek yasayî heye. Ev çarçoveya yasayî bi siyaset û pîvanên siyasiye rêjîmên deselatdar ve girêdaiye. Lewma di rêjîmên teng, îdeolojîk û dij demokratîk de pitir mafê mirovan tê binpê kirin, heya di sîstemên ku li gor pîvanên demokrasiya liberal hatine ava kirin. Bi kurtî qedera rewşa mafê miroavn û siyasetê bi hev re girêdaiye. Dema siyaset vekirî û demokratîk be, mafê mirovan pitir tên parastin û dema siyaset girtî be, pitir binpê kirina mafan çê dibe.
- Pêgavek din ya giring ku civaka navneteweyî û sîstema NY dikare û pêwîste bike ewe ku alîkariyê bide rêkxistin û saziyên civaka sivîl. Konseya Mafê Miroavn dikare an bi avakirina mekanîzmek taybet alîkariyê bide wan rêkxistin û saziyan da ku bi awayek serbest bikaribin li Îranê kar bikin. Ji ber ku saziyên civaka sivîl û rêkxistinên ku li ser mafê mirovan kar dikin dikarin bi rapor û agahdariyên xwe, bi têkoşîna berdewam û bi alîkariya rêkxistinên navneteweyî, hem pêşiya binpê kirina mafê mirovan bigrin û hem jî agahiyên di derbarê wan mafan de li nava civakê belav bikin.
- Xala dawî ku li pêwendî di gel karê raporterê nû de giringe ewe ku bi alîkariya Konseya Mafê Mirovan zaniyariyên di derbarê mafê mirovan de, çarçove û pîvanên mafên mirovan û agahiyên hevşêwe di nava civaka Îranê de bêne belav kirin. Ew pêgav dikare alîkar be da ku agahdariyên di derbarê binpê kirina mafan de jî bi awayek sîstematîk werin kom kirin. Ji ber ku yek ji pirsgirêkên sereke li ser riya komkirina agdariyan li ser binpê kirina mafên mirovan ewe ku haya beşek ji civakê ji sinûr û çarçoveya mafên bingehîne miroavn tune ye. Lewma beşeke giring ji binpê kirina mafan di civakê de nayên eşkere kirin.

Eger destnîşan kirina raporterê taybet bi wan pêgavên ku hatin rêz kirin re be, wê ev pêgava Konseya Mafê Mirovan ya NY bi kêrî rewşa mafê miroavn li Îranê bê. Xên ji wê yekê, wê ew biryar jî weke biryarên dine Neteweyên Yekgirtî li ser Îranê, bi tenê li ser kaxezê bimîne.

# Birîtanya Îranê bi metirsî li ser dever û cîhanê dizane



Wezîrê berevanî yê Birîtanyayê di hevpêvênekê de li gel televîzyona Elerebiye ragihand ku Îran ji bo ewlehiya welatên deverê metirsîdar e.

Navhatî amaje bi vê yekê kir ku di demekê de ku Îran serkevtiyê guherînên niha ên deverê derkeve, tenê ji bo wê deverê ne, belkî bo hemû cîhanê dê metirsiyek mezin be.

Foks di pêwendî ligel destêwerdanên Îranê di pirsa Behrîn û eşkerebûna tora sîxorên rejîmê di Kowêtê de, got: Em di derbasbûyî de jî ji pirsa Îranê li hember guherînên deverê de nîgeran bûn. Îran dixwaze bi mifahstandin ji girûpên Hemas û Hizbulla û girûpên din, bandorê bixe ser guherînên deverê.

Herweha navbirî ragihand ku em li ser 3 mijaran li hember Îranê nîgeran in. Berî hertiştî naveroka vê rejîmê ye ku çima ev rejîmê tenê di meha Çileya Paşîn de pêtir ji 60 kesan li sêdarê dan, nerazî tepeser kirin û fetisandina azadiyên ragihandinan di wî welatî de berdewam kir.

Nigeraniya din a Birîtanya, mifahstandin ji Hizbûlla û Hemasê ji aliyê Îranê ve bi armanca nifûz di deverê de ye.

Pirsa sêyem, pirograma navikî a vê rejîmê ye. Hewlên rejîmê ji bo bidestxistina çekên navikî, zemîneyê ji bo welatên din ên deverê ji bo destpêragihîştina bi çekên navikî xweş dike.

Wezîrê Berevanî yê Birîtanyayê got: Em li Birîtanyayê li ser wê bawerê ne ku xelkê Îranê her wa hevpeymanên me bûne û pirsgirêka eslî ya me li gel nîzama desthilatdar di Îranê de ye ku çima ligel yasayên navnetewî de hevaheng nine, lewma emê berdewam wê rejîmê binçav bikin.

Rojev

# Xebat û qurbanîdan di pêxema azadî û serbestiyê de



Dara Natiq

Ne kêm in ev xurtên xebatkar û azadîxwaz yên netewa me ku hemî temen, jîn û jiyana xwe di pêxema bidestveanîna maf û azadiyên gelê xwe de gorî kirine. Bi dirêjahiya dîroka xebat û cangorîtiya netewa me, bi hezaran şoreşvan û xweşmêrên qada xebat û şoreşê, canê xwe gorî rizgariya ax û welêt kirine, sîngê xwe kirine mertal û cendekê xwe kirine şevata xebatê, bo vê çendê ku netewa wan û nifşên paşeroje welatê me di bin siya xebat û berhema ked û tekoşîna wan de bêhna xwe vedin û di çarçêweya civakekî azad û serbest de, jiyanek tenah û bextewer bidomînin.

Tevgera azadîxwazane a netewa me bi rêberiya PDKÎ di heyamê zêdetir ji şeş dehik ji xebata tejî ji evraz û nişîv û tev ji fidakarî û cangorîtiya xwe de, di pêxema dabînkirinîa mafên neteweyî ên gelê Kurd li Rojhelata Kurdistanê û serxistina hikûmetek demokratîk û fedîral de, nirxek zaf daye û gelek şehîdên bihagiran pêşkêşî baregeha azadî û demokrasî û dadperweriyê kirye.

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, weke hêza siyasî a herî mezin di Kurdistana Îranê de, ku ji tev akinciyên Kurdistanê: kedkar, cutkar, zehmetkêşên bajar û gundan, rewşenbîr, xwendekar, karmend, pîşesaz û bazarî û bigiştî kesên welatparêze tev tex û qatên azadîxwaz û welatparêze netewa me pêk hatiye ku bi dirêjahiya dîroka xudî destanrêse xwe de, nevestane di pêxema dabînkirina paşerojek ronahî û vekirî a siyasî de û bo avakirina civakek bextewer û pêşkevtî, cihgîrbûna demokrasî û bilindkirina buhayên mirovî, weke mafê mirov, dadperweriya civakî û misogerkirina azadiyên take kesî û pêkanîna jiyanek tenah û birûmet de, xebat kirine û canê xwe gorî wan armancan kirine.

Rastiyek haşajênekirye ku her takek ji civaka Kurdistanê, li gor her delîve û fersendek ku jêre çê bibe, pişikdarî di xebata neteweyî-demokratî a netewa me bo gehîştin bi aştî û azadiyê û dadperweriya civakî de kiribe, rêz û rûmetek taybet ji xwe re misoger kirye, lê şehîdan binirxtirîn sermayeya jiyana xwe ku canê wan e, di vê rêya pîroz de gorî kirine, herlewma rêz û hurmeta wan, li derûna her yek ji xelkê welatparêze me de cih girtiye û di hemî warekî de şehîdên me mafek zêdetir bi ser hemiyan ve heye û serbilind û serwerfirazê vê xebata berheq û azadîxwazane in.

Eva ku girîng e û ji tev aliyekî re rohn û eşkere ye ku felsefeya wicûdî a xebata rizgarîxwazane a gelê me bi rêberiya PDKÎ dabînkirina mafên neteweyî ên gelê Kurd di çarçêweya sîstemek demokratîk û federal û cehdkirin bo pêkanîna civakek bextewer û jiyanekî tenah û evroyî ye bo xelkê Kurdistanê. Herlewma tê xuya kirin ku di vê pêxemê de bi hezaran şehîd û qorbanî dane.

Ewa ku di vir de hewceye bihê şirove kirin ew e ku, vê partiyê tu car şehîdbûna xurtên azadîxwaze welatê me weke armanc bo gehîştin bi hez û xwastekên xwe berçav negirtiye û piropagendeyên şaş û nedirust bi merema haydana seha xurtên welatê me di vê rêyê de nekirye. Ger mêzeyî pêvajoya xebata dûr û dirêj a partiya demokrat bikin, bi zelalî tê xuya kirin ku partiya han berevajî hin part û saziyan din, tu demekê xurtên azadîxwaz û şoreşvane welatê me hay nedane bo penabirin ber xweteqandin û xwekuştin û xweşevitandinê û... bi merema berjewendiyên xwe û şehîdbûna xurtên xebatgêr û azadîxwaze welatê me, weke nerît û alav bo gehîştin bi armancên xwe bi kar neaniye.

Belku ewa ku di pêvajoya bizava rizgarîxwazane a netewa me bi rêberiya partiya demokrat hatine şehîd kirin, xebat û qorbanî dan bûye di pêxema rizgarî û gehîştin bi azadî û serbestî û herifandina kela dîktatorî û rizgar bûn ji destê zulm û zora sîstema dîktator û dagîrkerên paşayetî û Komara Îslamî a Îranê.

Vê partiye zêdetir ji şeş dehikan e ku xebat û berevanîkirina xelkê Kurdistanê dijî tepeserkirina hovane a rejîmên dagîrker, bi jêhatî û bivêrane rêberî dike. Xebat û têkoşan û qorbanîdana endam û alîgir û pêşmergên qarimane partiyê nifûz û xweştevîbûna PDKÎ di nava civakê de zêdetir ji berê jêhel biriye. Fîdakarî û cangorîtiya xebatgêrên Partiya Demokrat henoke ne tenê bûye hegera xweştevî bûna tev xelkê Kurdistana Îranê, belku bûye cihê rêz û xweştevî bûna gelên din yên Îranê û derweyî Îranê jî. Lewma wek dibînin ku ev şoreşvanên ku di pêvajoya xebatê de şehîd bûne û canê xwe gorî rizgariya gel û welatê xwe kirine, berxudan û qurbanîdan bûye di pêxema armancên bilinde mirovî û jiyanek tenah û birûmet, neku xebat bo mirin û şehîd bûnê, belku xebat bo avakirina paşerojek ronahî û jiyanek tenah û birûmet ji xwe û netewa xwe re. Rêberê mezin şehîd Dr. Qasimlo li ser vê bawerê bû ku her nifşek diviya bixwe biryarê li ser terzê careserkirina doza Kurd bide û di vê bawerê de bû ku "gava em weke nifşa îro erkê xwe bi başî bi cih bînin, dikarin hivîdar bin ku nifşa paşerojê şehîdê wan tunabin, herwisan ger nifşa derbasbûyî erkê xwe bi başî bi cih gehandiban, renge ev nifşa me ya îro şehîde wan tuneba".



# diyardeya xwekujiyê û xemsariya rayedarên rejîmê

Kewêzer

Her çiqas ku dem derbas dibe diyardeya xwekujiyê di Îranê de zêde dibe û berpirsên rejêmê jî xemsar in û xwe ji pejirandina wê rastiyê, û herweha girtina amar û eşkerekirina goriyên wê pirsgirêka civaka Îranê diparêzin. Hêjayî gotinê ye ku berpirsên rejîmê li hember liqawdanan ragihandinên giştî, sazî û navendên mirovhez ên Îranî û cîhanî de jî, diyardeya han diveşêrin û di basên li ser wê pirsgirêka civakî ku cihê pêşgîriyê ye, bi pirsek şexsî dihesibînin.

Kêm û zêde diyardeya xwekujiyê di dîroka Îranê de hebûye, lê di sala 1991'an pêve, pêvajoya qewmînên wê diyardeyê, lezek zêde bi xwe ve dîtiye. Ewa jî nîşaneya kartêkeriya nerênî a sîstema siyasî a desthilatdarên Komara Îslamî li ser pirsên civakî ye.Ger mirov di hêla civakî de mêzeyî dîroka desthilatdariya Komara Îslamî bike, rewşa civakî a welatê me di wan 32 salên desthilatdariya rejîmê de qonax ber bi qonax ber bi xirabbûnê ve çûye. Diyardeya xwekujiyê jî yek ji arîşeyên girîng ên civaka Îranê ye ku sal bi sal amara xwekijiyê zêde dibe. Ji aliyek din ve ger ji sedemên xweklujiyê di Îranê de bihê fikirîn, mirov nikare sîstema siyasî û birêveberiya Komara Îslamî bi sebebê bingehîn yê zêdebûna bûyerên xwekujiyê nezane.

Li gor vekolînên çalakên mirovhez, sedemên ku di Îranê de dibin hegera xwekujiya mirovan, pirsgirêkên malbatî, atifî "evîndarî", abûrî, nesaxiyên cismî û derûnî, îtiyad û bêkarî di rojevê de tên xuyakirin. Ger em wan pirsan bikin du beş, beşek ji wan weke aloziyên nav malbatan, pirsên atifî " evîndarî" û nesaxî, di rastî de pêwendî bi paremayîbûna civakê ve hene, ku her yek ji wan jî nabe bi tu awayekê bi pirsên şexsî ve bihên girêdan, belkî ji pêşgiriya wan pirsgirêkên malbatî û atifî ku dibin seba xwekujiyê re, rêçareyên taybet hene ger desthilat di hewlên micit de be. Yek ji riyên pêşgirî yan kêmkirina wan bûyeran û hemû arîşeyên civakî, danîna navend û organên taybet bi wî warî ne. Di Îranê de bo xelitandina hizrên giştî hin organên taybetî hatine damezrandin ji bo pirsên civakî, lê ew organ jî weke hemû organên din ên hikûmetî di xizmet desthilat û îdeolojîka Komara Îslamî de ne.

Armanca sereke ya damezirandina organên civakî berî her tiştî dana zanyariyên pêwîst ên civakî ne û danîna yasayên bingehîn û xweser bibê têkiliyên siyasî û îdeolojîkî ji bo hînkirina xelkê bi rêsayên civakî û pêşgirî li hember riftarên serberedayiyane di malbat û civakê de, herweha danîna cezayên adilane bibê cudahiyên netewî, mesebî, fikrî û ..., bo kesên yasaşkên li hember yasayên giştî di nav civakê de ne.

Dema ku tê dîtin, di cîhana ku bi lezek zaf pêşdikeve, lê riftarên malbatî, evîndarî û atifiyên "amateur" û nesaxiyên di encama nebûna zanyarî di hin kiryaran de li welatê Îranê ku xwekujî jê dikeve, nîşaneya guhnedana desthilatdaran bi pirsên civakî û nebûna xebata di pêxema pêşketina civakê, di paremayîhiştina xelkê û di nezaniyê de bi armanca xwe layiqzanîna maneve di desthilatê de ye.

Ku wusan bû, desthilat li hember tu yek ji wan sedemên xwekujiyê ên ku di bin givaşan de dipejirînin û radigehînin ku "xwekujî hegera pirsgirêkên şexsî di Îranê de heye", bê tawan nine.

Di beşek din a sedemên xwekujiyê, pirsên îtiyad, destkurtî, bêkarî û pirsa jihevveqetyana jin û mêran in, ku bi awayekê jî herçar ji wan pirsan bi hevre girêdayî ne.

Ger paremayiya civakî hêcet be ji bo pirsgirêkên malbatî ên ku dibin sedema xwekujiyê, lê pirsên îtiyad, bêkarî, nedarî, bi sedema wan sê pirsgirêkan e ku zêdebûna telaq ku dibe sedemên xwekujiyê, bi tu awayekê rejîm nikare hêcetan jêre bibîne. Bêkarî pirseke ku rasterast pêwendî bi birêvebiriya desthilatê ve heye.



Bêkarî di welatek dewlemende weke Îranê de, bi sedema nebûna bernameyek giştî bo xelkê û henbûna helawardin di civakê de, herweha birçîragirtina xelkê ji bo ku çav ji destên desthilatdarên xwesepîner bin, tê holê. Pirsa îtiyadê jî ku arîşeyek herî mezin a civaka Îranê ye û hûrbîniyn wê zaf caran hatine baskirin ku di vir de baskirina wan nehewce ye, bi fakter jî hatiye eyankirin ku sedemê bingehîn yê belavbûna îtiyadê di Îranê de rejîma Komara Îslamî ye û Sipaha Pasdaran jî mezintirîn tora qaçax a madeyên hişber e.

Her du pirsên bêkarî û îtiyadê dibin seba nedariyê û di encam de jihev hiloşîna malbatan ku ewane sedemên eslî ên xwekujiya endamên malbatan di Îranê de ne.

Hin sedemên din jî hene bi taybetî ji aliyê ciwanan ve, weke kişandina bala xelkê ku di encam de canê xwe ji dest didin, sedem û şîweyek din jî ji aliyê jinan ve tê birêveçûn, ew jî xwekujî bi armanca gihandina dengê nerazîbûna xwe li hember zolma newekheviyê di malbat, civak û bi giştî di cîhanê de ye bi guhên raya giştî.

Bi giştî xwekujî di Îranê de belayek mezin e û nahê haşakirin. Zaftirîn goriyên wê diyardeyê jî jin in ku pirraniya wan di riya bixoftirîn şîwe wate xweşewitandinê ve gorî dibin. Hejmara jinên ku dest bo xwekujiyê dibin bi qasek zaf ji a mêran pêtir e, lê kêmtir di wan bûyeran de canê xwe ji dest didin. Wate pirraniya mêrên ku dest bo xwekujiyê dibin, canê xwe ji dest didin. Ewa jî vedigere ser şîweya xwekujiyê ku pirraniya mêran di riya çekên germ û xwedaliqandinê ve xwekujiyê dikin. Lê pirraniya jinan ji riya xweşewitandin û dermanxwarinê ve ku derfeta pêragihîştin û rizgarkirin wan ji mirinê hene, mifahê werdigrin.

Bi awayek din ger mirov cuxrafiyaya xwekujiyê di Îranê de li ber çav bigre, tê dîtin ku herêmên kêmanî ên netewî bi taybet netewa Kurd di pileya yekimîn a xwekujiyê de ne. Parêzgehên Başûrê Kurdistana Îranê wate Îlam û Kirmaşan di pileyên yekim û duyem de ne û parêzgehên Kurdistan û Azerbaycana Rojava jî di refa wan parêzgehan de ne ku xwekujî tê de zaf e û di pileyên yekimîn ên parêzgehên Îranê de ne. Ewa jî nîşeneyek eşkere ya helawardin ji aliyê rejîmê ve di girîngîdan bi pirsên civakî di navbera herêm û netewe û hizran wan di Îranê de ye.

## Mirina hezaran muitadan di sala derbasbûyî de bi madeyên hişber ên senietî



Di sala 1389'a Rojî de muitadên Îranê ji madeyên hişber ên senietî "kirak" li cihê tiryak û madeyên din mifah wergirtine. Birêveberê navenda berevanî li hember madeyên hişber got ku di sala derbasbûyî de mifahstandin ji madeyên hişber ên senietî "kirak" ji aliyê mutadên Îranê ve di pileya yekimîn de bûne.

Navhatî bi amajekirin bi gihandina zanyariyên nerast di warê madeyên hişber di debistanan de dibe seba kunckolbûn û şopandina qutabiyan li dîv wan madeyan.

**Mirina 2600 mutad di sala derbasbûyî de**

Tevlîhevkirina madeyên cur bi cur ên hişber ji xwîna mirovan heya xwîna heywanan li gel tiryakê û hebên cur bi cur ên hişber û hiroîn, herweha mifahstandin ji "esîd" ê di çêkirina şîşe û tiryakê de, dibe seba mirina zêde ya mutadan.

Li gor amara ku ji aliyê pijîşkê yasa yê welat ve hatiye belavkirin, di sala derbasbûyî de 2633 kes bi sedema zêde bikaranîna madeyên hişber, canê xwe ji dest dane ku di nav wan de 129 kes jin in. Amarek durust ji mutadên bi şîşeyê re nine lê organên pêwendîdar mijûlî komkirina amara mutadên bi şîşeyê re ne ku heya niha ew amar di pêvajoyek pir zêde a mutadan de derbas dibe.

www.arsivakurd.org

# Sîstema perwerde a Îranê û çend gotinek!



Sadiq vehdanî

Sîstema perwerde û hînirinê di Îranê de, sîstemek e di xizmeta siyasetên Komara Îslamî de bi bêy berçavgirtina usûlên perwerdehiyê. Di destpêkê de, sîstema perwerdeya her welatekê divê li gor rastiyên civakî û taybetmendiyên wî welatî û dûr ji alîgirî û xizmet bi îdiolojiyekê yan hikûmetek bihê bingehdanîn.

Herweha sîstema han di Îranê de pênaseyek giştî bo hemû qutabiyan bi awayê wekhevbûna wan heye û tu car bi cudahîdanan û taybetmendiyên qutabiyan girîngî nedaye. Wate renge hin ji qutabiyan di wê pênaseyê de cih negre, ku yek ji mînakên herî eşkere di wê siyasetê de berçavnegirtina netewên Îranê ye. Helbet di vê babetê de em naxwazin şiroveyek taybetî ji pirsên netewî di Îranê de bikin, lê nêrîna wekhevbûna hemû qutabiyan ji aliyê sîstema perwerde ya Îranê dibe sedema vê yekê ku di dibistanan de qutabiyên ku nekarin di çarçoveya wê sîstemê de cih bigrin, ji holê bihên rakirin.

Herweha nebûna hizrînek rexnegirane û neçarkirina qutabiya bo pejirandina mijarên dersî ên diyarîkirî, bûye hegera vê yekê ku dibistanên Îranê bibin alavek bo gihandina buhayên diyarîkirî ên hikûmetî.

Yek ji armancên avabûna dibistanan bi wateya modern, hevkarî bi qutabiyan re bi armanca civakîbûna wan, lê di Îranê de rêvebirina nêrînek yekalî navbera qutabî-mamosta, û tenê guhdarîkirina qotabî bi mamosta bêyî vê çendê ku derfeta lêkolîn û dan û standin hebe, di rastî de nikare piroseya civakîbûnê di wan temenên serekî ên dibistanê de derbas bike. Di wê rewşê de hin ji qutabiyan bi armanca perwerde û hîbûna zanistê naçin bo dibistanan, belkî li rûyê neçarî û nebûna sîstemek bêtir a perwerdeyê di welat de rû dikin dibistanan. ji ber ku seqayek neçarî û sepandî a dibistanan wan eciz dike. Pêka şiroveyek derûnnasane wan tûşî dilkutek zaf ji dibistanan dike.

Yek ji taybetmendiyên din ên sîstema perwerde ya Îranê, bikaranîna nêrînek riftarî di nav dibistanan de ye, wate hin mijarên dersî hatine diyarîkirin û asta hînbûna qutabî li gor fêrbûna wan mijaran tê nirxandin. Di wê rewşê de renge qutabiyek bi "IQ" (hiş)ek bilind jî nekare pêka wan mijaran xwe biguncîne û numreyek hêjayî xwe ji wan dersan wergire.

bike û pêka wan şiyanan pisporiyê bidest bixe.

Di nav Sîstema hînbûn û perwedeya Komara Îslamî de, birêveberên dibistanan tenê rêveberiyek îdarî dikin, ewe di halekê de ye ku dibistan cihek civakî ye û birêveberên wan divê pêtir rêveberiya çandî bikin, wate divê daxwaz, kultûr, dîrok, "tenevoi", û... ên qutabiyan nas bikin heya ku bikarin rêveberiyek çandî di dibistanan de bixin nava sîstema perwerdeyê de. Lê em dibînin ku îrade û xwasta sîstema niha a perwerdeya Komara Îslamî di dibistanan de, ne sîsteme ku birêvebniriya çandî bipejirîne, ku waye di vê sîstemê de rêveberiyek çandî bi hizra desthilatdarên sîstema perwerde a Komara Îslamî, ne hewce ye.




Her wusan ku pêştir me amaje pêkir di nav sîstema riftarî de cudahî û taybetmendiyên qutabiyan ji hevdu negirîng e û rewiştên cuda di nav qutabiyan de tiştek normal e û ew şiroveya ku sîstemek yekdest û yekreng ji hemû qutabiyan re heye bi armanca perwerdeyek vekhev di riftara qutabiyan de bi giştî ne zanistî ye û di sîstema niha ya perwedeya cîhanî de nêrînek şaş e. Di sîstema îro ya perwerdeya cîhanî de her qutabiyek li gor şiyanên taybetî bi xwe tişt hîn dibe û asta xwe nas dike û kesek yan sîstemek tu tiştî jêre diyarî nake. Bikaranîna nêrînek mirovî di dinyaya modern de hevkariya qutabî dike ku şiyanên xwe nas

Di rêveberiya çandî de, rêveberan li gor taybetmendiyên ferhengî, civakî û... ên qutabiyan ligel wan riftar dikin û her dibistanek pêka cihgirtin di deverek taybet ên siyasetên xwe de diyarî dikin, lê siyaseta Wezareta Perwede û Hînkirinê, siyasetek hevpar di seranserê Îranê de ye.

Baskirin ji şaşiyên sîstema han di Îranê de derfetek û demek pirr dixwaze, ger em weke mînak amaje bi her yek ji faktorên hewce di sîstemek standard a cîhanî de bo perwerdekirinê bikin, bi tu awayekê nikarin wan yasa û rêsayan, di sîstema Perwerdeya Îranê de bibînin.

## Givaşa Bexşdariya Sîlwana bo ser werzêrên deverê



Heyameke Bexşdarê devera "Sîlwana" a Urmiyê, Yehya Xosrewzade, givaşek zaf xistiye ser werzêrên deverê.
Li gor rapora nûçegihaniya Kurdistanê: Navbirî bi hêcetên weke "herêma cadê" ewlehiya organên ser bi hikometê û ..., îzna çandin û mifahstandin ji zewiyên derdora sêraya Rajanê nade xelkê wê deverê û pêşî ji avakirina xaniyan jî di wê herêmê de digre. Ewa jî di demekê de ye ku hejmarek ji xwedîzewiyan bi armanca çareserkirina wê pirsê, heyamek berî niha, nameyek bo "Beyta Rehberî" û "Deftera Serokkomarî"ê şandibûn, lê heya niha tu bersivek wernegirtine.

## be te ......



Sefye Xalidî

**be te dil girtiye mirovahî, bîra te nine**

**piştî cend heyaman bûy biyanî! yasa evîn e**

**dîsan bêjim heger çuy birsyara min axê bigre**

**dergehên hemû dilan veke, dilên pêsoj girtine**

**çi resme! resma dinê ker ker kir cergu hinav**

**dizanim tu jî dizanî, hemû tê de sêwî ne**

**her demên me evin û evindarî, yan dil şikandin**

**jîna şev bi roj keyf û şahî, tu kes nabîne**

**kal bibû zarokê cindi, hemû gava dixebitî**

**agrê xeman de şewitî, gazinde kir, çi jîn e**

**zarokê bêkes ezim, gel taliya bûme xizim**

**bê ronî jînê dixwazim, belku ew min bihebîne**

**dinivisînim derdê dûriyê bila bahoz bibet**

**danêt qeraxê ey dil, bo xeman tijî çine**

**bahoz nikare axxx, lênûsa xema giran e**

**çol û çiya nahebîne, esman de dihejîne**

**ez ji ber resma dinê tewaw dikim vê gotinê**

**bê te ez mame tenê, dil birîn û çav pirr xwîn e**

www.arsivakurdi.org

Dr. Abdulwahab Xalid:

# Me bivê yan nevê, îro be yan sibe be, pêwîst e ku Kurd Elifbêya zimanê xwe ber bi Latinî ve bibin

**Xwanndevanên hêja û birûmet yên Agirî, herwek agehdar in ku pirsa zimanê sitandard û elifbaya Kurdî, di heyamê wan çend salên derbas bûyî de, yê bûye cihê niqaş û gengeşeya parek berçav ji rewşenbîr, zimanzan û siyasetvaên civaka me û bala bîr û raya giştî a Kurdistanê bo aliyê xwe kêşaye. Di vê derheqê de gelek hizr û nêrînên cur bi cur dixuyin. Lewma me bi hewce zanî ku di vê hejmara Rojnameya Agirî de, bo şirovekirina aliyên cur bi cur yên vê mijara girîng û balkêş, hevpeyvînek taybet bi birêz Dr. Abdulwahab Xalid re çê bikin. Xwandevaên rêzdar kerem kin bo bas û nîqaş li ser vê mijara balkêş, em bihev re hevpeyvîna han bişopînin.**

Hevpeyvîn: Dara Natiq

**Gelo, hûn ziman bi çi awayekî pênase dikin?**

Ziman diyardeyek e ku bi gelek avayan û ji gelek aliyên cuda ve dihête pênase kirinê, bo nimûne ji aliyê civakî ve weke diyardeyeka civakî serederî li gel dihête kirinê û ji aliyê neteweyî ve bo demekê dirêj ziman weke binemaya serekî a pêkhateya neteweyî tête naskirin û heta niha jî vê hizirê giringiya xwe ji dest nedaye.

**Di hişyarbûn û pêşketina netewan de rola ziman çiye?**

Zimanên mirovayetî helgirên tev dîrok û kelturên neteweyan e û her netweyeka karî bit giringiyê bi zimanê xweyê neteweyî bidet şiyaye gavên baş di parastina keltura xwe ya netewyî de bavêje û evî kelturî jî bikete bingehek bo pêşketin û geşkirna paşeroja xwe.

**Rewş û zirûfa ziman di rewşenbîriya Kurdî de, dişibe çi?**

Diviya rewşenbîriya Kurdan bi zimanê Kurdî be, bo vê yekê jî netewa Kurd di vê qonaxê de ji her qonaxeka din pêwîstî bi geşekirin û xortkirina rewşa zimanê xwene hember evê hewa mezina cîhanî bûnê ku ji aliyekî ve rolekî xirab li ser zimanên cîhanê heye û mezintirîn gefa ji navçûn û mirinê li ser zor ji zimanên netewayên cîhanê li seda bîst û yekê.

**Zimanê Kurdî di sedsala bîstan de û bi dirêjahiya dîrokê di nava rews û pevçûnên pir dijwar de, mezin bûye, lê bi bawera we rewşa han tu bandorek li ser zimanê Kurdî çê kiriye?**

Zimanê Kurdan li sedsala bîstê de ketiye nava komek ji rewşên cuda de, ji alyekî ve dijwarî û qedexekirin û siyaseta cînusaytkirina hember zimanê Kurdî hatiye sepandin herwekî heta niha jî ev siyasete li hindek welatên mîna Turkiya û Sûryayê da dihête li darxistin. Ji alîyekê din ve zimanê Kurdî geşe û werareka baş bi xwe ve dîtiye hember dagîrker û dagîrkaran û bûye hêmayeke berxweden û serhildanên netewî yên Kurdan û şoreşên Kurdî li tev parçên Kurdistanê.



**Jînameya brêz Dr. Abdulwahab Xalid:**

**- Sala 1965'an a zayînî li bajarê Dihokê hatiye dinê.**

**- Xwandina xwe ya destpêkî li bajarê Dihokê bi dawî înaye.**

**- Li sala 1988'ê Zayînî bawernama Bekaluriyosê bi (Ziman û Edebê Kurdî) li Zankoya Selaheddînê wergirtiye.**

**- Li sala 2000'ê zayînî li heman zankoyê bawernama Masterê (M.A) di pisporiya zimanê Kurdî de wergirtîye.**

**- Di sala 2007'an a zayînî de her li Zankoya Selaheddînê bawernama Diktoraya felsefe (PH D) di warê Zimanê Kurdî de wergirtî ye.**

**- Niha Profîsorê harîkar e li Zankoya Dihokê û serokê pişka Zimanê Kurdî ye û serokê kolîja Adabê ye.**

**- Pişkdarî di zor Konferans û xebatên zimanevanî de kirîye li Herêma Kurdistanê û li derveyî Kurdistanê jî de. pitir ji pênc pirtûkên weşandî derheq zimannasiyê hene û bi dehan gotar û lêkolînên akadîmî û naakadîmî di biyavê lêkolîn û şirovekirna zimanê Kurd îda hene.**

**- Endamê Yeketiya Nivêskarên Kurd e, şarezaye di biyavê rewşenbîrî û ragehandinê de.**

**Zimanê Kurdî di tu qonaxek dîrokî de, nebûye zimanê perwerde û fêrbûnê, herwiha nebûye zimanê fermî. Di zirûfek dijwar a han de ziman ber bi winda bûnê ve diçe. Lê gelo çava dibe ku zimanê Kurdî heya îro hebûna xwe parastiyê?**

îro li herêma Kurdistanê (başûrê Kurdistanê) zimanê Kurdî bûye zimanê rewşenbîrî û medya û perwerdeyê, dîsan bûye zimanê zanist û birevebirna karên kargûrî û fermî yên hikumeta herêma Kurdistanê. Lê di parçeyên din yên Kurdistanê de ev rewş tu neye.

**pêşdeçûna ziman û serxwebûn vê çavan li hev tesîr dikin? Ziman di mercên derveyî serxwebûnê de jî dikarin bê asteng xwe bi pêş de bibin û bibin zimanê perwerdehiyê?**

Helbet hebûna deshelat û dewleta serbexwe ya Kurdan zaminê geşe û werara zimanê Kurdî ye ku dikare xwe tevî jiyana serdem û guhartinên bilez ên sedsala bîst û yekê bigoncîne. Zehmet e di kawdanekê derveyî serxwebûnê de ziman bikare pêş bikeve û bibe zimanê pirosêsa perwerdê û fêrbûnê, nexasime eger li welatekê de li dov yasayekî ew ziman yê qedexe be mîna rewşa zimanê Kurdî li dewleta Turkiyê yan Sûriyê yan bi şêweyekê ji şêwan li dewleta Iranê.

**Hûn rewşa Kurdîstana Başûr di warê çand, ziman û edebiyatê de çavan dibînin û bi bawera we bo pêşxistina ziman di vê herêma azad de diviya çi bihê kirin?**

Rewşa zimanê Kurdî li herêma Kurdistanê (Başûrê Kurdistanê) ger bihête hemberkirin tevî rewşa zimanê Kurdî li parçeyên din yên Kurdistanê ev rewşe ya baştir e ew jî ji vedigere ser du fakterên serekî, yek jê ew e ku di bingeh de zimanê Kurdî li dewleta Iraqê li pey destûra dewletê bi awayekê fermî ney qedexe bû serbarê wan zext û givaşên ku ji aliye rijêmên yek li pey yek ên Iraqê ve li ser wî dihatine bicihînan. Faktera duyem, rewşa azadbûna Başûrê Kurdistanê bû li sala 1991'ê rengvedana wê di tev warên jiyanê de û nexasime jî di vejandin û geşesendina zimanê Kurdî de li behra pitrya biyavên rewşenbîrî û perwerdeyî û zanistî û kargêrî de, lê ev rewşa hana ku di herêmê de peyda bûye dîsan pêwîstî bi pilandananê ye bi awayekî zanistî û nexşe darêjtinê ye bo paşerojeke nêzîk û dûr yê zimanê Kurdî. Pêwîst e rengvedana wê jî di sîstema perwerde û zankoyên herêmê de reng vedet zêdebarî damezrandina Enstîto û Akadîmiyên taybet bi lêkolîn û şrovekirina zimanê Kurdî bi sercem dîyalêkt û devokên wî ve û danana ferhengeka yekgrtî ya zminê Kurdî ye ku tev peyvên zimanê Kurdî di nav ropelên xweda hembêz biket. Ji aliyê zanstî jî ve pêwîst e ku ferhengên taybetên têrmên zanistî bo gişt pisporiyan ji aliyê komîtên pispor ve bihêne berhevkirin û rêkxistin û ji aliyê kargêrî û fermî jî ve pêwîste zimanê birevebirin û kargêriyê bi rêk û pêkî bihête rêkxistin û giringî bi dîyalekt û devokên zimanê Kurdî bihête dan rê bihête xoşkirin bo bi destve hatina zimanekê yekgirtî yê edebîye Kurdî.

**Hûn rewşa wêjeya Kurdî a îro çavan dibînin?**

Wêjeya Kurdî bi awayekê giştî ber bi werar û geşesendinê ve diçe, bi taybetî jî li zankoyên herêmê bi rengekî giştî lêkolîn di mijarên ciyawaz û hemereng de dihêne kirin, ji bilî vê çendê di nav grûpên nivîskar û behremendan de giringî pê dihête dan, dîsan bi avayek ji avayan medyayên Kurdî xwe ji mijara han xudî derdikevin.

**Di wan çend salên derbasbûyî de, li Kurdîstana Başûr, zaf caran em guhdarê helwestên hin rewşenbîran dibin ku dibêjin bila zaraveya Soranî bibe zimanê gelerî yê Kurdan, hûn wî di warî de çi dibêjin?**

Di zor hevdîtinên xwe de derheq pirsa zimanê standard helwestê min ew bûye ku carê hêşta zûye Kurd hevrikiyê li ser dîyalêkt û devokên xwe bikin, niha hêşta dema xebitîn û encamdana lêkolîna ye li ser zimanê Kurdî û bo vê qonaxê berwext cut standerî bo haletê niha yê zimanê Kurdî heta astekê baş e û li paşerojê jî geşe û werara zimanî bi xwe dê biryarê

www.arsivakurdi.org



det û cihê xwe bigre kanê kîj zaravê Kurdî dê bikare wek zimanê standerd û fermiyê Kurdan, bêy jibîrkirina tu dîyalêkt û devokên şirînên zimanê Kurdî û ev helwêsta min jî ji valatiyê nehatiye eger em hêvkeyne destudara zor welat û zimanên cîhanê pêvajoya wan her bi vî away bûye û di heman qonaxê de derbas bûye.

**Elfabêya Kurdî, çima divêt ku ya latînî be?**
Me bivê yan nevê, îro be yan sibe be, pêwîst e ku Kurd Elifbêya zimanê xwe ber bi Latinî ve bibin û çend gavekê bileztir be helbet wê baştir be.

**Ji bo zimanek sitandard yê Kurdî gavên pêdivî çine?**
1- Danana ferhengeka yekgirtî ya tev devok û zaravên Kurdî.
2- Çespandina siyasetên zimanî û pilandanana zimanî ji aliyê zanayêyn pispor
û deshelatên Kurdan ve.
3- Encamdana lêkolînan di tev aliyên şirovekirna zimanî de.
4- piştî bicihhatina van xalên li serî yasayên taybet bi zimanî ve li bilindtirîn
deshelata Kurdî, divê bihêne darêjtin ku parlemana Kurdistanê ye.

**Hûn zafbûna zaraveyên zimanê Kurdî çavan dibînin? Li gor raya we kêşeya elfabêyên cuda yên di nava Kurdan de wê çavan çareser bibe?**
Hebûna devok û dîyalêktên Kurdî dewlemendî ye bo zimanê Kurdî, pêwîst e mifah jê bihête wergirtin li vir pêwîste ji bîrnekeyn ku devok û diyalêktek ji wan helgra beşeka keltûr û dîroka Kurdan e û binbir bûn yan jinavçûna her yekê ji wan wate ji navçûn û mirina beşek ji keltûr û dîroka Kurdan ku êdi çi car nahête qerebûkirin.

**Hûn xebata Rojnameya Agirî di warê çand û zimanî de çavan dibînin?**
Bêy sitayşên zêde karê we yê pir pîroz û hêja ye her serkeftî û berdewam bin bo xizmeta ziman û rewşenbîriya Kurdî.

# Google-a bi soranî avabû



Piştê danûstandinên saziya teknolojî û zanyariyan a Herêma Kurdistanê, ku li gel şîrketa mezin a binav û deng, Google'ê pêk anîn, çend roj berî niha bi şêwezarê Kurmanciya Jêrîn(Soranî)/Kurdî, Google'ê dest bi xizmeta bi Kurdî kir.

Ev pirojeye, ji aliyê saziya teknolojî û zanyariyan a Herêma Kurdistanê û şîrketa Google'ê ve hate amadekirin û herwiha hat ragihandin ku di wî warî de, gelek xebatên din ên teknolojîk hatine amadekirin û dê di rojên pêşiya me de bikevin xizmeta bikarhênerên zimanê Kurdî.

Ew kesên ku dixwazin bi zimanê Kurdî 'Goole'ê bikar bînin kerema xwe bila bikevin vê navnîşanê: www.google.iq

NETKURD

## Rehim Nemab



**Ceifer Mûbeşirniya**

Vijdan,
Di xewa hirçek werza Zivistanê de bû
Çav,
Di bin keviyên berfa cemsera bakûr de bûn
Guh,
Kevirên bin gomê bûn
Însaf,
Bibû Arê nav teraşê
Elinda sibêyekê,
Zarokek sêwî,
Bi çavên geş
Nêrînên xwe avêtibûn ser şûnpiyên şehîdekê
Bi hizra vegeryana bavê xwe.
Şûnpiyên şehîd erd veqelaştibûn
Ji xwe re dikeniyan
Li êwarek pirr xemgîn de,
Jinek ciwan
Bi çavên terr
Nêrînên xwe rawêxistbûn ser şûnpiyên şehîdekê
Bê hîvî ji vegeryana evîna xwe
Ji şopandina şûnpiyên wî difikirî
Şûnpiyên şehîd,
Bi evîndariyê dikeniyan
Hizra zarok digot:
Bavên çûyî deşta jêrîn
Wê ji min re şekir bîne
Çavên jina ciwan digotin:
Lawê min çûyî çiyayê jorîn
Êdî venagere
Hevalê wî wê ji min re destikê beybûnan bîne
Çemê erzînê jî her wa bi gur û bi şîpel e,
Qey carekê hêmin nabe
Mizgîniya şekir bide zarok
Hêviya evînek ji nû ve bide jina ciwan
Nejî bi şîpelên xwe hawar bike û bibêje
Ew çi destek reş e,
Têkil dibe bi xwîna me
Ne bang dike,
Biviro dê bese daran bibre,
Xo destikê te jî dar e

www.arsivakurdi.org

# Agirî

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye
Ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne

www.kurdistanmedia.com/kurdi
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat:
AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE
E - Mail: agiri2003@hotmail.com
agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com




## Li Herêma Kurdan di sala 2010'an de 72 jin hatin kuştin!



Di nava salekê de (2010) li herêma Kurdan 72 jin, ji ber sedemên cuda hatine kuştin, 113 jinan jî bi riya xwekujiyê dawî li jiyana xwe aniye. 73 jinan jî xwestiye xwe bikujin. Her wiha tecawiz û destdirêjiya li ser jinan her berdewam e. Di sala 2010'an de, li 76 jinan tecawiz hatiye kirin, 45 jin jî hatine tacîzkirin".

Şaxê Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) ê Diyarbekirê rapora xwe ya derbarê binpêkirina mafên jiyana jinan eşkere kir. ÎHD'yê got ku di binpêkirina mafan de zêdebûn heye.

Şaxê Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) ê Diyarbekirê di çarçoveya 8'ê Adarê Roja Jinên Cîhanê de, daxuyaniyeke çapemeniyê lidarxist û rapora xwe ya 2010'an a li ser çewisandina jinan ragihand.

Daxuyanî ji hêla endama ÎHD'yê Rehşan Batarayê ve hate xwendin û got ku li gorî rapora ku amade kirine, zêdebûna binpêkirina mafan balê dikişîne ser xwe. Rehşan Batarayê wiha berdewam kir:

"Bi taybetî di sala dawî de, bûyerên ku wekî "kuştinên namûsê" an "kuştinên evînê" têne zanîn, di raya giştî de ciheke girîng ji xwe re terxan kiriye, lê dîsan jî derbarê vê yekê de, di warê zagonî û îdarî de tu gav nehatine avêtin.

## Xelata a wêrekiyê bi pêşnimêjê dîn yê Urmiyê hat dayîn



Ji aliyê Ehmedînijad ve xelata yekem a wêrekiyê bi Xulamriza Hesenî, Pêşnimêjê mizgevta şîeyên Urmiyê hat dayîn.

Mela Hesenî bi egera xebat li dijî Kurdên Îranê û beşdarî di şerê Îran û Îraqê de ew xelat pê hatiye bexşîn.

Nemirovahiya Mela Hesenî û xoşxizmetî bi rejîma xwînmij bi qasekê bû ku rehm bi kurê xwe jî nekir, piştî serkevtina şoreşa gelên Îranê û dizîna berê wê ji aliyê melayên kevneparêz, navhatî penagaya kurê xwe yê ku ser bi Fedayiyên Xelq bû ji rejîmê re eşkere kir û di dawiyê de kurê wî hat îdamkirin.

Ji aliyek din ve birêveberê giştî yê "Mîrasi Ferhengî" yê Azerbaycana Rojava gotibû, Hesenî di destpêka înqilabê de li hember PDK Îranê û Komeleyê de rolek berçav hebûye û herweha moreyek kilîdî yê şerê Kurd û Eceman li Nexedeyê de bûye. Lewma hêjayî vê yekê ye ku navê wî di refa şûnwarên menewî ên Îranê de bihê sebtkirin.

Mela Hesenî di hevpeyvînekê de ligel heftînameya Çilçirayê de gotibû: Şûnwarên kevnar du cur in. Ên ku di xizmeta Îslamê de ne, diviya bihên parastin û ên din jî divê bihên jinavbirin.

## Kuwêt dîplomatkarên Îranî der dike



Piştî pêkhatina aloziyên navbera wan dewletan, Kuweytê biryar daye, 3 dîplomatkarên Îranê yên li Kuwêtê bi sûçê encamdana kar û çalakiyên sîxurî ji Kuweytê dîport bike.

Wezîrê Derveyê Kuweytê Şêx Muhemed El-sebah roja pêncşemî li parlemantoya welatê xwe de ji rojnamevanan re ragihand, ku dê Kuweyt 3 ji dîplomatkarên Îranê ji xaka xwe dûr bike.

Şêx Muhemd Elsebah got, ku ew hersê kes beşek ji tora sîxuriyê ne, ku dezgehên ewlekariyê yên Kuweytê çend roj berî niha aşkira kiribûn û roja sêşemî jî cezayê darvekirinê bi ser wan de sepandin.

## Dîsa şerê li ser zeviyan: 5 kes hatine kuştin




Li navçeya Siverek ya Rihayê bi sedema lihevnekirina di derbarê zeviyan de şer derket û di encama wî şerî de 5 kes hatine kuştin 4 kes jî birîndar bûn... Li gora agehdariyên gihiştî, bi şev dûrî 15 kilometeran ji navceyê şer di navbera du malbatan de çêbû ku bi sedema li hev nekirin di derbarê zevîyan de dijminatî di nava wan de çêbibû.

Di encama wî şerî de ku silah jî tê de hatine bi kar anîn, Ömer, Adnan, Nihat, Fatih Acemoğlu û Mehmet Emîn Bucak (43 salî) mirin. Elî(43 salî), Sakıp Bucak (32 salî), Erkan Küçükbayrak (17 salî) û Hasan Oyman jî birîndar bûn. Piştî bûyerê birîndar bi ambûlansan rakirin nexweşxaneyê û hate zanîn ku xeter li ser jiyana çend birîndaran heye.

**Avestakurd**

## Hevalbendiya partiyên kurdan pêk tê

Serokê Partiya Maf û Azadiyan (HAK-PAR) Bayram Bozyel got, gotûbêjên ku bi armanca hemû partiyên kurdan bi hev re têkevin hilbijartinên 12ê Hezîranê yên Tirkiyeyê, ber bi encambûneke erênî didomin.

Bozyel derbarî mijarê de ragihand ku wan biryar girtibû ew wek HAKPARê têkevin hilbijartinan, lê ew ê li gorî encama gotûbêjên ku di nava partiyên kurd de dimeşin, tevbigerin.

Bozyel got, ger li ser hevkariyê lihevhatin bibe, ew ê deverên ku namzetên serbixwe nîn in, namzetên sembolîk deynin, lê ger lihevhatin nebe, li 81 bajaran ew ê namzetên xwe nîşan bidin.

Bozyel destnîşan kir ku hevdîtin ê di nav çend rojan de bi dawî bibin.

Wî got, ew ne di çarçoveya berjewendiyên partiyê de, li gorî berjewendiya gel nêzîkî meselê dibin û domand, "Armanca me ne ew e ku, çend hevalên me bibin parlamenter. Divê partiyên kurd, hilbijartinê di warê yekîtiya neteweyî de wek gaveke pêşketî binirxînin."

Bi pêşniyariya Kongreya Civaka Demokratîk (KCD), bi armanca ku BDP, HAKPAR û KADEP di hilbijartina 12ê hezîranê de "hevalbendiya hilbijartinê" bikin, kom bibûn û gotûbêj ev mehek e didomin.

**(AKnews)**

## Melayê hikûmetî: Sêzdebider jî tiştek xurafatî û bê mana ye



Ayetulla Mekarim Şîrazî ji "merceiên teqlîd" di bersiva pirsekê di warê Sêzdebiderê de got: Sêzdebiderê rîşalên şerîî ninin û ji xurafatan e.

Pirsa han ev bû: Gelo di warê şerîî de Sêzdebider tu pirsgirêkek heye?

Bersiva Şîrazî: Sêzdebiderê rîşalên şerîî ninin û xurafat e, lê siyahetên saxlem bibê guneh û bibê bawerî bi biyombûna 13 yê nepirsgirêk e.

Ev melayê rejîmê berê jî derheq Kuleçarşemiyê jî gotibû, Kuleçarşemî sunnetek xurafî ye û nabe em nerîtên xurafî birêve bibin û ji hemûyan girîngtir, herikandin"israf" a mal e û nabe mirov malê xwe xisar bike.

www.arsivakurd.org